Piştî heftakî deh rojan dema ez çûm nexweşxaneyê, min şoka asasî li wir dît. Ji ber ku hejmarê HIV-RNAYê pir zêde bû, ya CD4ê jî gelek kêmbû. Lê belê ji ber ku doktorê min tirs û xofa min dît, min bi serokê klînîkê re da axaftinê û ew jî diyar kir ku ez pir bi endîşe me. Gotinên serokê klînîkê wiha bûn: “Binêre Îdîl, ev HIV-RNAYê zêde û CD4a kêmbû wênêya AIDSê ye. Lê belê tu ji piya hatî vir, ji piya tê û diçî, te şewbê derbas kiriye û hîna te dest bi dermankirinê nekiriye. Ev yek jî me re diyar dike ku te nû înfekt girtiye û HIV li pilê xistiye.” Min jî jê re aşkere kir ku berî bi çar mehan min operasyonê derbas kiriye û di testên min de tu nîşane derneketine ku bi HIVê înfekte bûbim. Ew jî diyar kir ku panzdeh sal e di wê nexweşxaneyê de ew klînîk hebûye û rastî bi hezaran HIVpozîtîv bûne; di nav van nexweşan de ji sedî dehê wan dermankirinên xwe nedomandine, ên mayîn jî pêvajoyên xwe yê miyane û kontrolê didomînin; di nav ewqas nexweşan de bes yek jiyana xwe ji dest daye, ew jî ne ji HIVpozîtîvê jî ber qeyrana dil miriye. Diyar kir ku tu ferqa wê û nexweşîyên mîna tansiyon û şekirê jî hev du nemane, û tika kir da ku ez bêtîr endîşedar nebim.

Heman şeva wê rojê ew hevala hevala min a aktîvist li min geriya û tiştên gelek xweş gotin: “Binêr Îdil ev ji bo me “wake-up-call (banga şiyarkirinê)” e, yanî banga vejînê ye. Ji ber ku tu jiyane cardin saz dikî, tu dikarî navbera xwe û şahiyên şevê sar bikî, tu dikarî kêma alkol vebixwî belkî, tu dest bi sekse ewletir dikî. Hem ji bo te hem ji bo partnêra/ê te baştir dibe asoxî.”

Welhasil, di wan deman de êş û azarên min hinek din ji dom kirin. Di destpêkê de wek ku min nedikarî tevahî derman xwe ji SGKê [Saziya Ewlehiya Civakî] werbigrim. Piştî ku min ew pirsgerêk çareser kirin, nêzî mehek û niv şûn de min dest pê kir dermanên xwe vexwarin. Min qasî mehekê derman xwarin Da ku hîn bibim bê laşê min li hemberî dermanan dij-qewet e an na. Axirî piştî dermanan hejmara CD4ê zêdetir dibû û hejmara HIV-RNAê jî kêmtir dibû. Doktor li encamên min nêrî û go “ev derman mûcîze ne.” Lewra rewşa min a înfeksiyonê gelekî bi paş de kişiyabû.

Di vê navberê de dixwazim behsa hin çirokên şaş bikim ku wekî rastî têne zanîn. A yekemîn dermanekî ku hemû vîrûsan bikuje nîne. Derman hejmara HIVê gelekî kêma dike, di cî de be, wan dicemidîne ku nikaribin bilebitin. A duyemîn, tê gotin “madem ez bi HIVê înfekte me tu jî HIVpozîtîv î, em bêyî parastinê dikarin hev şa bibin”; ev jî gelekî şaş e. Ji ber ku vîrûsa her kesî jê re “yekta” ye. Lowma jî yekê/i HIVpozîtîv ger derman negre û bi yeka/ê HIVpozîtîv ya/yê dermannebûyî re hev şa bibe, di vê rewşê de dikare hîper-înfekt bibe. Kesên HIVpozîtîv bi dermankirinê re şeweya jiyana wan naguhere, lê ji bo kesên hîper-înfekt rewş gelekî aloztir dibe. Ji ber ku pergala îmmûnî [parastinê] ya mirov hewl dide ku zêdetirîn vîrûsan re şer bike.

Em vegerin mijara xwe, bi pêvajoya dermanbûyîne re dest pê dike tu baş dibî. Di derbê ewil de min seksê nedikir; lê dûre li ser navê “vaye xwe diparêzim” ha min dît ku dîsa zêde seksê dikim. Wê demê min dev ji karê seksê berda bû lê min “*cîcîlikê*” berdeyam dikir. Dûre min fahm kir ku ev rewş zirarê dide min û ji hêla derûniyê ve ne li xêra min e. Min nedikarî hêrs û kerbên xwe kontrol bikim. Rewşa obsesyone pêkhatibû. Her carê tirs ku ez ê dermanên xwe wenda bikim li min peyda dibû. Ji ber sedemên bi vî rengî piştî bi salekî jî

destpêkirina dermanan, li ser pêşniyaza hevalekî min li Zaningeha Stenbol li Fakulteya Tibê ya Cerrahpaşayê min psikyatreke li ser vê mijarê dixebite peyda kir. Doktoreke gelekî xweşik bû, her ku nasnava min a transê dizanibû jî ez rastî cudaxwaziyê nebûm. Piştî şeş mehan diyar kir ku ji bo wê jî ezmûneke gelekî girîng bûye, go “baş e ku min bi yeka wekî te re hevdîtin pêkanî.” Her carê ku ez diçûm ji bilî dermankirinên rûtîn me psikoterapî jî dikir. Carinan bêyî randevû jî ez diçûm ji ber ku dema poliklînîka wê nedibû, ji destan randevu dida min. Ez gelekî bi siûd im ku min karî pê re hevdîtinê saz bikim, lewra gelek caran ne pêkan e bêyî ku mirov pere bide di nexweşxaneyên dewletê de alîkariya psikolojîk werbigre. Nêzî şeş mehan min pêvajoyekê derbas kir. Di dawiya şeş mehan de bi temamî rehet bûm, ez hîn bûm tevî HIVê bijîm, min pê derxist bê çî çî ye, ez bi ser ketim ku bibim mirovekî ji ber HIVpozîtîvê nagirî.

Ev rewş ji bo min ewqas zor be, ez texmîn dikim bê ji bo wan kesên din ên li derve çiqasî zortir e. Ji ber ku piştî ez hînbûm ku HIVpozîtîv im û min ji hevalên xwe re aşkere kir pê ve yek ji hevalên min jî bi pêşdarazî bi min re neaxifin. Tenê yek du kes li pey min gotegot kirine, ez wan jî bi HIV-fobiya wan re rû be rû dihêlim.

Li Nexweşxaneya Perwerdehî û Lêkolînê ya Okmeydanî pêvajoya xwe ya kontrola HIVê berdewam dikim. Bi nasnava xwe ya transê re ji doktorê xwe re vekirî me û heya neha rûberî tu gotinek transfobîk nehatim. Ez dihesêbim di vî warî de ez gelekî bi siûd im. Hekîma malbatê ya li taxa me jî tê de min tu pirsgirêk nedît. Rojekê qet ji bîra min naçe, qirika min diêşiya, ji bo nivîsandina dermanê ez çûm cem doktorekê/î nêzî cihê karê min ku ne hekîma min a malbatê bû. Doktorê ez çûmê, jimara nasnameya T.C.ê [Komara Tirkiyê] li ser pergale nivîsî, dermanên min her û her bikartînim dîtî û sedema bikaranîna min pirsî. Min go “ji bo kezeba reş e”, min ji ser xwe avêt. Dûre tirs ket nava dilê min û cardin neçûm cem wî doktorî. Çareyek lazim bû ji vê yekê re, ji xwe ji ber karê xwe bi dilê rehet min nedikarî biçim her doktorên înfeksiyonê. Cara dinê, rojekê ez çûm cem hekîmê xwe yê malbatê. Malbata min di axaftineke berê de diyar kiribûn ku hekîmê me yê malbatê gelekî agresîv e, mirovekî teşqele ye. Ez jî dema diçûm tim pirs hebûn di serê min de, min digo

“hêvî dikim bera min nede, bi awakî xerab tevnegere.” Dema ez çûm min dît hekîmê min ê malbatê gelekî rûken e û li dijî min qet bi eks an dilşikên tevnegeriya. Dûre min jî xwe ji hekîmê min ê malbatê re aşkere kir. Min diyar kir ku ez HIVpozîtîv im û min go “di vê mijarê de dixwazim bes hûn min bibînin.” Yekem pirsê wî ev bû; pêvajoyê di çî astê de ye û gelo di xala bidestxistina dermanan de problemên min hene an na. Ew roj esil ji bo kolestrolê çû bûm ku xwîn bidim. Bang li xanima hemşîre kir û jê re go “Îdil xanim Hepatit A ye, dema we xwîn jê girt ji bîr nekin lepik bixin destê xwe.” Ev pîr bi xweşa min çû. Ji ber ku li wê derê mahremiyeta min parastibû. Di vî warî de nikarim bibêjim ku min ji karkerên tenduristiyê cudaxwazî dît. Lê belê tiştêkî wiha heye, ez êdî karê seksê nakim û di warekî din de dişuxlim. Ji ber pêşdaraziyên li cihê kar qet nafikrim xwe aşkere bikim. Ji ber ku pêşdaraziyên civakî zêdetir in. Di derdora xwe ya sosyal de hema bêje ez vekirî û aşkere me. Ji ber ku hevalên li derdora min hema hema giş kesên politîk in û di vî biwarî de dikarim bibêjim xwedî hişmendiyek in. Di vî biwarî de nexebitin jî parêzerên mafên mirovan in. Ji ber ku min tu pêşdarazî ji van mirovan hêvî nedikir bi rehetî min karî ji wan re aşkere bikim. Ez vê yekê jî dizanim ku di vî biwarî de bi hezaran mirov hene bi qasî min ne bisiûd in û bi tevahî girtî û veşartî ne.

Piştî hînbûna HIVpozîtîvê di navbera eza kevn û eza nû de cudahiyeke heye. Wekî ku wê hevala min gotibû “wake-up-call”, pê re dikarim bibêjim min pîr û pergalek saz kir di jiyana xwe de. Wekî ehlaqparêziya ku biskek berê min gotibû ez ê tevnegerim lê belê dem bi dem şahiyên şevê li gel xwe hîn rîskan jî tîne. Mirov ji dêvla xwebaweriyê “tişt bi min nabe” dest pê dike bêtir bi kontrol tevdigere. Ji bilî vê ez bawerim jiyana bi HIVê min bêtir xurt kir. Ez bi xwe ji xwe re dibêjim min li hember HIVpozîtîvê û fobiya li gel wê li ber xwe dabe dikarim li hember tiştên dîtir jî li ber xwe bidim. Ji ber ku ez difikrim li hember tiştêkî gelekî zehmet têdikoşim. Êdî cîhaneke min a biçûk heye aîdê min e. Ez hildibijêrim bi kê re têkildar bim, ez dizanim bê li ku derê biseknim. Hewl didim bi pîr û pergal rakevim, xwarin bixwim. Bêtir ji bo hevalên xwe demên vala vediqetînim. Li biskilête siwar dibim. Hewl didim werzişê. Bêtir dîgerim. Geryanên derveyî welatê bêtir in, lê li wan deran jî rûberî hin pîrgirêkan

dibim. Ji ber ku hin welat hene êşkuj bi xwe jî qedexe ne. Bi tenê, bes, mînak didim ger hûn nexweşên psikyatrê bin hûn dikarin dermanên xwe yên raporkirî werbigirin. Ji bo HIVê jî lazim e hûn raporkirî bin ku karibin dermanan bixin wî welatî. Min pirsgirêkeke bi vî rengî di çûna Gurcistanê de dît. Min ê du sê rojan bimaya, loma jî min biqasî têrê wan deman derman li ba xwe girt; lê belê çi dibe çi nabe divê min dermanên xwe veşarta. Heçî di cî de be gotin, min nedizani derman xwe bixim ku derê. Heta ku tişteki qerfi ye, ez bi riya bejahî diçûm, em li nêzî sînore Gurcistanê sekinîn. Di destşokê de min dermanên xwe xistin kîsên piçûk piçûkî, li ser bincilên xwe bi cî kir, bi vî hawî min sînor derbas kir. Li ser min agirkujên din, dermanên din jî hebûn. Min mecburî ji ber tirsê ku dermanên min ên asasi jî bêne zevtkirin avêtin çopê. Axirî tu diçî geryanekê lê belê mixabin mirov bi kirinên wiha re, li welatekî nenas bi pirsgirêkên bi vî rengê re rû bi rû dimîne.

Em vegerin rewşa min tenduristî ya neha, hejmara CD4ê bi berdewamî zêdetir dibe û HIV-RNA jî di asteke de ye ku êdî nayê tespîtkirin. Ez aneha ji kesên din bêtir fikra xwe dikim ji ber ku riska derbasbûyînê, ji min bo yekê din, di asta tunebûnê de ye.

Di lêkolînên dawî ên zanistî min xwend, dibêje “kesekî HIV di xwîna wî de di asteke wiha de be ku nikaribe bê tespîtkirin, riska wî ya ku derbasî hinekî din bike nîne.” Lê ez xwe diparêzim, ez ê xwe biparêzim jî, ji ber ku ez naxwazim ji hinekî din vîrûs derbasî min bibe.

Neha flortekî min heye, pê re jî seksa parastî dikim. Ew dixwaze em seksa neparastî bikin lê ez wê yekê qebl nakim. Car bi car li ser vê mijarê problemên me çê dibin. Ez di vî warî de jê re ne eşkere me. Ger ez bêjim, ez ê bertekeke çawa bibînim wê jî nizamim. Ez xwe aşkere bikim, hêla wê ye dîtî an nedîtî bê li cihekê, mirov ditirse ku ew ê te îfşa bike. Beleheq pêknehatine hin dirûsmên mîna “HIV nakuje, Pêşdarazî dikuje.” Pêşniyaza min li hevalên bi HIVê teşxîskirî, nifşa nû ya aktîvîstan diyar dikin ku bikaranîna kondoman wekî xweferzkirina şîrkêtên kapitalîst dibînin lê mixabin ew mijar ne wisa ye. Kondom ne bes ji înfeksiyona HIVê jî gelek vîrûsên din jî mirovan diparêze, lewra teqez kondom bikarbînin. Ji vîrûsên mîna Piştistî, Hepatit B û Hepatit

C û hwd jî dikare biparêze. Ez nîqaşên dawî ên li ser vê mijarê ku li Amerîkayê dimeşînin jî dişopînim. Di demên dawî de di derbarê dermanê *Truvada* ku wekî mucîzeyek tê lansekirin nîqaş didomin. Mirovînan xwestin *Truvadayê* wekî rêgir û prep. bikarbînin. Heta ku hin kes gotin em vêya bikarbînin dev ji prezervatîfê berdin. Lê ev tam ne rast e. Mirov dema xwe diparêzin ne bes ji bo HIVê ji bo vîrûsên din jî divê xwe biparêzin, lê tu bandora rêgir û parastîner ya *Truvadayê* li ser vîrûsên din tune ne. Lewma jî kî çi dibêje bila bibêje, bila wekî ku di nav kapîtalîzmê de noq bûbim nav li min bikin, ez ê dişa jî dermanên xwe bixwim û bikaranîna kondomê bidomînim.

Wekî encam ez lê zêde bikim, dikarim bibêjim vekişîna min a ji qada polîtîk jî bi sedema teşxîsbûyîna min a pozîtîv re girêdayî ye. Ji roja ku min xwe di ez li gel mafdarên bûme, li hember neheqiyê sekinîme. Nemaze di demên dawî de ew çend mirov xistin hepîsxaneyan, ew çend mirov ji pêvajoya xwe ya tedawiyê dûr man; ji sedemên cur be cur gelek girtî di warê peydekirina dermanên xwe de pîrsgirêk dikşînin, em van gişan bi çavê xwe dibînin. Ger ez jî rojekê bikevim girtîgehê an demeke dirêj di binçavan de bim tîrsa min ne ew bû ku ji karê xwe bibim. Bi rastî ez tîrsiyam ku dermanên min demekê dirêj nedin min ez ê pîrsgirêkên tenduristiyê bikşînim. Yek ji sedemên ku ji siyaseta aktîv dûr bibim, ji polîtîkayê dûr bûbim jî ev tîrsa li min raselîtî, bû.

HIV xususî ne vîrûseke LGBTÎ+yan e. Bes ji ber ku em di vî warî de vekirî ne, em ew çend vekirî dikarin di derbarê van mijaran de xebatan bimeşînin, derdorên fobîk hewl didin bi vî hawî bidin lansekirin. Mixabin ev têngîhiştin li piraniya welatên li cîhanê wiha ye. Li welatên azad ku di malperan de bêser û ber pesnê wan didin... Mînak li Paragwayê wekî hemwelatî nagirin. Ne pêkan e hûn destûra herdemî ya rûniştinê werbigrin.

Li cîhanê li hin welatan dermanê HIVê hîn bi pere ne, li Tirkiyê peydekirina dermanan li gor gelek welatan hêsantir e. Her kesê xwedan sîgorte, bi dayîna buhaya têker ya miayenê, bêyî ku buhaya têker ya dermanê bide dikare dermanê bi dest bixe. Kesên bêsiqorte jî bi awakî kêmbuha dikarin xwe bigihînin miayene û dermanê. Di vî warî de dikarim bibêjim ku tetbîqên Tirkiyê diecibînim.

Hevelekî min ê alman hebû demekê dirêj li vir mabû, bi taybetê ji bo Stenbolê gotibû lê bi min gelek di cî de bû tiştên wî gotî. Ji min re gotibû “Stenbol wek Berlîna 1990î ye. Bêsinor, bêparastin seks gelekî berbelav e li vir. Gelek kes xwe neparêzin, her kes ne xwedan hişmendiyeke e di derbarê vîrûsan û riya derbasbûyîna wan de û mirov hin caran ji bo têkiliyên bêparastin tînin teşwîqkirin.” Ev di vî warî de tev li wî hevalî dibim. Ne bes ji bo HIVê, ji ber gelek vîrûsan û ji ber gelek baktêriyan divê mirov xwe biparêzin. Sîgorteya min a tenduristiyê hebû. Malbata min piştî min girt û qet min pêşdarazî nedîtin. Dibe ku siûda kesî ya wekî min nebe, mirov xwe di hundirê çahlekî de bibîne ku civatê ew dahv daye wê derê.

Nebêjin Ha Li Vir Tiştên Xweş Nakevin Jiyana Min

Merhaba. Navê Min Mahan e. Îranî me. Min li Îranê li ser Dîroka Hunerê zaningeh kuta kir. Li cihê kar nasnava min a LGBTÎ+ hatibû deşîfrekirin. Deşîfrebûna nasnava min a zayendî ewlehiya jiyana min nemabû. Serokê kargehê, dema nasnava min a LGBTÎ û HIVpozîtîvê hîn bû, dest pê kir gefan li bixwe. Bi tîrsa teşhîrbûyîne min hemû tiştên xwe hiştin, mecbûr mam birevim vê derê.

Serê pêşî min serî li NYê kir ji bo bicîkirina li welatên sêyemîn. Wekî sedema serîlêdanê min nasnava xwe ya LGBTÎ+ nîşan da. Di serîlêdanê de min diyar kir ku di heman demê de HIVpozîtîv im. Aneha li Tirkîyê li bajarekî pêgirtî ku ji bo penaberan saz bûye hewl didim jiyana xwe bidomînim. Nêzî panzdeh meh berê hatim Tirkîyê.

Berê wekî tûrist hatibûm Tirkîyê. Ez vê derê ji wan demên ku wekî tûrist dihatim cudatir nabînim. Bes, tiştêkî xerîb e, berê cihê ku ez ji geryanê çûbûmê aneha wekî penaber tîmê. Ez dizanim, hûn diçin ku dera cihanê biçin dema wekî penaber hin pîrsgirêkan dibînin; lê dawîkê hûn dielimin di wê çandê de bijîn. Li vê derê min pîrsgirêkên hewandinê, xwegihandina mafê tenduristiyê û ya herî girîng pîrsgirêka zimên min dîtin. Li gel pîrsgirêkên min dîtin dikarim bibêjim ez elimim vê derê. Heta ku ez dikarim bibêjim min ji Tirkîyê hez kir. Dema ewilî hatim vê derê, di daxwaza xwe ya NYê de, bo bicîkirina li welatên sêyem, min diyar kir ku ez dixwazim biçim

Amerîkayê. Lê belê bi hîlbijartina Trump re fikrên min bi temami guherîn. Di derbên ewil de min nedixwest li Tirkiyê bimînîm, lê belê di pêvajoya hatî de ez li ser ihtîmala mayînê jî difikrim. Heta ku ev wekî berê bi min xerab nayê.

Pirsgirêk ev e; li Tirkiyê saziyên dewletê jî tê de, dema fahm dikin ku tu penaber î, dest pê dike tu rastî cudaxwaziyên dibî. Ya herî nêz li gel emlaqfiroşan jî nijadperestî pêk tê. Dema fahm kir tu biyanî yî yan dibêje xanî nîne, yan jî buhaya kirêkirinê zêde dike. Neha li xaniya ku tê de me, li qata wê ya destpêkê emlaqfiroşek heye, ji min re gotibû “hûn travestiyan Îranê ne, ji we re xanî nîn e.” Ecêb e, aneha li qata jora wî rûdinê. Ji bo xaniya ku tê de me 1000 lîre kirê didim. Di bajerekî wek vî biçûk de, ji bo xaniyekî ew çend xerab ev buha gelek e; lê belê tu penaber bî mixabin buha ev e û ji bo stara xwe ez mecbûr im vê buhayê bidim. Nebêjin ha tiştên xweş jî nakevin jiyana te. Eve du hefteye min bar kiriye vê xaniyê û cîranên min ji xaniya kevn di barkirinê de hatibûn ji bo bibêjin “riya te ronî be.” Heta ku gelekên ji wan qet nexwestin ez biçim û vê oxirkirina wan ez gelekî kêfxweş kirim. Hê jî dema ez cîranên xwe yên kevn dibînim em silav li hev du dikin, diaxifin.

Ger em bêne ser mijarê înfektbûna min HIVê. Ev sê sal e ez dizanim ku HIVpozîtîv im û ev du sal û nîv e ez dermanê bikartînim. Hejmara barê min ên vîral ev du sal e di asteke wiha nizm de ye ku nikare bê tespîtkirin. Di navbera 2008 û 2009an de ez li derveyê welat dijiyam û min qet li testê nenêrî bû. Hevaleke min hebû ew bi xwe jî piştî kansêrbûna xwe bi şensa xwe hîn bûbû ku bi HIVê dijî. Hevalê min piştî kansêrê bi şeş mehan çû ser dilovaniya xwe. Kansêrbûna wê û sedema mirina wê me baş dizanibû ku ne ji ber HIVê bû.

Li pey vê bûyerê her kes pir tirsîya û gelekên me testa xwe da çêkirin, min jî li testa xwe da çêkirin. Encama testê negatîv derket.

Berî bi sê sal û nîvan li Îranê di laşê min de birînên dijwar û bi şid derketin û ev birîn dixuriyan. Ji ber ku pir ditirsiyam min testekî nû da çêkirin. Roja ku min ê encamê bigirta pîrr bi strês çûm. Mixabin li Îranê kesên ku di wan cihan de dixebitin qet haya wan jê nîne

bi kesekî HIVpozîtîv re çawa bipeyvin, pir cahil in. Hemşîreya li encaman dinêre, kaxizên min girtin û lê nêrî. Dema ku dît pozîtîv e, bêyî ku tiştêk ji min re bibêje kaxizê qefalt çû bi hevaleke xwe re bipeyve. Hingê tirs û strêsa min gelekî zêdetir bû. Her carê ku min dîgo “encam çi ye”, dîgo “ew ê hevala min ji te re bibêje.” Berê min dan cihêkî din û ez pênc deqe li wir li bendê mam. Ew ên li wir jî tim di guhê hev de dipeyivîn. Dûre doktorê ku hat cem min kaxiz avêt ser dev û rûyê min, diyar kir ku ez pozîtîv im. Dema min ji doktor pirsî “ez neha divê çi bikim?”, go “em nizanin, here ji vê derê.” Bi israr min pirsî bê ezê çi bikim, divê herim ku derê; ew jî gotin ku ew jî nizanin.

Yekê ciwan ji dêvla min bûya, ji ber helwesta wan dikaribû xwe bikujta. Min nedizanî ez çi bikim û ew kêlî hevalekî min hat bîra min. Min fikirî ku ji bo jiyane zêde dema min nemaye. Ez gelekî xemgîn bûm û ji jiyane sar bûm. Ji sibê heya êvarê digiriyam, pir ditirsiyam. Ji ber tirsê ku ez ê teşhîr bibim min karî bes ji çend hevalên xwe re bibêjim. Bo nimûne hevalekî min hebû. Dema min xwe jê re aşkere kir pê ve nema bi min re peyivî. Hê jî li hin cihên Îranê wek kotiyên li kesên HIVpozîtîv dinêrin, bi tirsê ji wan direvin. Hevalekî min hebû, berî min bi heft-heşt mehan hîn bûbû ku pozîtîv e. Ewilîn ez lê geriyam, ew min bir cihêkî li Tehranê ku bala xwe dide HIVê. Li wir xwîn ji pêçika min girtin, test kirin û ez dîsa pozîtîf derketim. Dûre min testa teqezkirinê (Testa *Western Blot*) da çêkirin. Encama wê testê di nav du sê hefteyan de dertê, dema encama wê testa min jî pozîtîv bû min dest bi dermanxwarinê kir.

Aneha difikirim, ne ji wî hevalê min bûya, ez ê biçûma ku derê, min qet nedizanî. Li navenda ku hevalê min ez birim, doktoreke jin hebû. Doktoreke pir hormetdar û zana bû. Ez bawerim doktorê înfeksiyonê bû û wê her tiştê ji bo min rave kir. Heta ku ji min re go “ne hewceye tu ji malbata xwe re jî bibêjî.” Go “ne hewceye tu di jiyana xwe de guherînan bikî.” Dûre min doktoreke din jî nas kir, navê wê Minoo Mohraz bû. Ji Mohrazê re li Îranê dibêjin “Dayika HIViyên” ji ber ku di vî warê de pisporeke gelekî zana ye. Nêzî 25 salan e li ser vê mijarê dixebite. Di heman demê de serokê yekemîn ya Navenda Lêkolînê ya li ser HIVê ye. Gelek alîkariya min û gelek kesên wekî min kiriye.

Dema yekem car çûm doktor, min jê pirsî: “Çend rojên min jiyane mane?” Doktor jî hinek bi qerfî keniya go “tu manyax î?” Dûre ji min re rave kir ku HIV ne wekî ku tê zanîn dike, bes bi tenê tiştek diguhere di jiyana te de lazim e tu dermanên xwe bi pîr û pergala bixwî. Dema ez li Îranê dijiyam ji bo miyêneya doktor min pere dida, lê min dikarî dermanên xwe bêpere werbigrim. Ji bo min ya herî zehmet ew bû, dema ez hîn bûn ku bi HIVê înfekte bûme, mirov wekî cinawiran li yê hemberî xwe temaşe dikirin. Mixabin min ev yek piranî li deverên jiyîna xwe ezmûn kirin. Lê belê wek hîn jî dizanin yekê HIVpozîtiv dema bi pîr û pergala dermanên xwe bixwe asta HIV-RNAyê di xwîna wî hingê nizm dibe ku nayê dîtin. Esil di vê rewşê de îhtîloma ku derbasî hinekî din bike ne pêkan e.

Di hemû planên xwe de min rewşa xwe ya HIVê dida ber çavên xwe. Mînak berî ku bêm Tirkîyê bi hûrgulî min lêkola bê ka ez ê karibim bi hêsanî xwe bigihînim dermanên xwe. Ez xal ji bo min girîng e, ji ber ku ferqa di navbera Îran û Tirkîyê de mijara dabînkirina dermanan e. Li vir tu dikarî ji dermanfiroşan dermanên xwe bistîni, li Îranê dermanfiroş derman nadin; tu ji navendê distîni û nehewceye sîgorteya te hebe ji bo ku tu dermanan bê pere bistîni. Bi ser de, li Îranê rojê min sê heb dixwarin li Tirkîyê ez du heban dixwim.

Hevalên min ên penaber wek hevalên min ên Tirkîyeyî li vir ditirsin testên xwe bi rêk û pêk çêbikin. Hêvî dikim ew roj bê, hemû hevalên min, hemû mirov bi awakî rêk û pêk testên xwe çêbikin û vê tirsê bêwate têk bibin. Ya herî xerab jî ew e ku mirovên vê derê piranî bêyî parastinê dikevin têkiliyên cinsî. HIV ne bes vîrûsek e ji riya cinsî derbas dibe lê belê divê mirov ji bîr neke ku bi riya cinsî jî derbas dibe. Jê pê ve bikaranîna kondomê ne bes ji vîrûsa HIVê, dikare mirovan ji gelek vîrûsan biparêze.

Dema ji Îranê hatim bi ceribandina çend riyan re min zêdetir derman bi xwe re anî bûn. Lewra piştî hatina vir bi gelekî şûn de min karî xwe bigihînim dermanên xwe. Di wê pêvajoyê de min dermanên ku ji Îranê girtibû cem xwe bi berdeyamî bikaranî. Li vir pirsgirêk e, nikarim demên li gor dilê xwe bi doktor re bipeyvim. Tirkî nizanîm û her daîm jî wergêr ne li cem min e. Û her carê naxwazim xwe ji

wergêrekî din re aşkere bikim; ji ber ku nikarim bi her kesî bawer bibim di vî mijarî de. Li Tirkiyê her tişt bes bi tirkî tê nivîsandin û doktorên vê derê jî tê de bes bi tirkî dipeyvin. Ya rastî bo nimûne her ku îngilîzî dizanin jî di daxwaza axaftina tirkî de israr dikin. Ev jî bo me penaberan pirsgirêkeke mezin e. Mesela dema ez û hevaleyê bi hev re ji bo êşa piştî min çûn nexweşxaneyê li cem wergêr ji min re go “tu pozîtîv î.” Esil divê ev veşartî bimaya û divê doktor vê yekê li cem wergêr negota. Ji ber tiştên wiha naxwazim bi wergêr herim cihinan; ji ber ku ne ewle ye ji min re. Dûre ez pê hesiyam ku doktor bi îngilîzî dizane û min ji wergêr re got “ji kerema xwe tu derkeve derve ez ê bi îngilîzî dewam bikim.” Min ev yek fahm kir ku doktor bi îngilîzî dizanin lê naxwazim bi îngilîzî bipeyvin.

Li vir dema diçim kontrola tehlîlên xwe, dema diçim xwîn bidim ji kesî re nabêjim, ji ber vê jî cudaxwazî nayê serê min. Lê belê ji ber penaberiyê her dem rastî cudaxwaziyê, nijadperestiyê dibim. Û dizanim, ger ez bixwazim ji hekîma diranan sûtê werbigrim rasterast dişînin îzmîrê. Lewra ji bo hevaleyê min a penaber û HIVpozîtîv vê yekê kirin. Li Tirkiyê penaberî zehmet e, tew penaberî, HIVpozîtîv û bi ser de LGBTÎbûn gelekî û gelekî zehmet e.

Ez Bavekî Pozîtîv im

Merhaba. Navê min Meçasu ye. Di salên 2000î de, li welatekî ku bi şerîatê îdare dibe çûbûm bişuxlim, di sala 2003an de li wir hînbûm ku pozîtîv im. Rojekê li cihê kar nexweş ketim çûn nexweşxaneyê. Ji min re gotin ku înfeksiyoneke giran derbas dikî û min sê mehan tedawî dî, lê tu encam negirt. Înfeksiyona di çavê min de her roj diçû dibû sedem ku çavê min bê girtin. Di vê navberê de doktor digotin ber bi başiyê ve diçe. Di xala dawî de, li ser %80-85 kêmbûna bînayiyê wê carê jî çûm nexweşxaneyêke Amerîkan ya li welêt. Di encama vekolînan de diyar kirin ku ez HIV im. Lê belê min nedizani HIV çi ye. Li nexweşxaneyê dest danîn ser ewraq û pasaportê min, diyar kirin ku vê rewşê jî ragihînin merciyên berpirs. Divê li vir pozîtîvbûna min nehata zanîn, ger bihata zanîn dibe ku tiştên xerab bihata serê min. Ji ber vê sedemê bi riya nasekî min ewraqên xwe kom kirin di nav panzdeh rojan de vegeyriyam stenbolê. Di wan rojê ku ez ê bihatama stenbolê de hîn bûbûm bê HIV çi ye. Tevahiya panzdeh rojê xew neket çavê min, heta ku min xwe gihand stenbolê. Min nedikari rakevim ji ber ku min difikirî; ger ez rakevim ez ê nikaribim şiyar bibim.

Dema ez hatim stenbolê karê ewilî ew bû, min ji doktorekî nas re rewşa xwe zelal kir. Doktor serê pêşî ji bo ku rakevim derman nivîsî. Di vê navberê de dema ez hatim stenbolê çavê min ê çepê bînayiya xwe ji sedî sed wenda kiribû. Ji ber ku sîgorta min a tenduristiyê

tune bû pêvajo pir hêdî dimeşiya. Min dermanên xwe ji kîsê xwe distend, gelekî buha bûn. Bi hevalê xwe yê doktor re ewilî em çûn cem doktorekî înfeksiyonê. Her du doktor dermanên kombîne dan. Her roj min bi lepan derman dixwarin. Têsrên din ên bi van derman re jî gelek bûn; mahdxelîn, vereşîn, êşên movikan. Ev pêvajo sê meh dom kir. Di nava van sê mehan de ez gelek caran fikirim ku dev ji dermanan jî berdim. Doktor go “tu yê bes van dermanan bikarbînî, bes van dermanan bikarbînî, wekî din çareya te tune ye.”

Tevî pêvajoya doktorê, min got ku ez pozîtîv im. Malbata min bi awakî maddî û manewî pišta min girt. Di destpêkê de min nedikarî ji bilî malbata xwe ji kesekî re bibêjim ji ber ku civak di vî warî de pêşdaraz e. Car bi car dema dihatim stenbolê min seriyek dida Komelaya *Pozitif Yaşamê* [Komeleya Jiyaneke Pozîtîv, n.w.]. Min agahiyên ku ji wê derê werdigirt bi malbata xwe re parve dikir: min diyar dikir ku ev vîrûs bi bikaranîna heman destşokê, heman pêjgîrê derbas nabe.

Piştî dabînkirina sîgorteya tenduristiyê jî pîrsgirêk nediqediyar ji ber ku bo destxistina dermanan jî lazim bû ez ji bajarekî biçim bajarekî din. Min dikarî bes ji Nexweşxaneyên Lêkolînê sûdê werbigrim. Destxistina dermanan du sê rojên min dixwarin. Carekê dema ku min di dabînkirina dermanên xwe de pîrsgirêk dikişand, min derdê xwe ji dermanfiroş re got. Berê min da Miduriyeta Tenduristiyê ya Bajêr, li wir min pîrsgirêkên xwe gotin.

Rojên ewil, dema diçûm nexweşxanê gelek caran rastî neheqiyar û vederkirinan dibûm. Mesela min rontgena xwe bigirta, karkerên tenduristiyê yên wê derê dest bi minminê dikirin: “nexweşîna ku te ji der ve girtiye tu yê derbasî me biki.” Dema diçûm miayeneya çav, min destê xwe bidaya ku derê aciz dibûn, wê derê paqij dikirin. Li nexweşxaneyê ji piya li bendê dimam. Kîjan bajar be, nexweşxaneya taybet an a dewletê qet ferq nîne li piraniya cihan rastî vederkirinê bûm. Dema diçûm cem doktor min form dadigirtin, di forman de li cihên “nexweşîneke we heye”, min dinivîsand ku “ez HIVpozîtîv im.” Her carê dema doktor nivîsa HIVê li wir didît digo “ez aneha têm” û ji odê derdiket. Her carê heman peyvan min dibihistin: “ji

ber sedema ku malzemeyên me têr nakin em nikarin li te binêrin.” Min ji doktoran re diyar dikir ku ger ez di formê de nenivîsim hûn ê agahdar nebin. Ji ber dilziziya min spasiya min dikirin û min bêyî miayeneyê vedigerandin. Dema diçûn xwîndayîne min hemşîreyên ku lepik nedixistin destê xwe hişyar dikirin derbarê vîrûsa xwe de. Merivekî min î doktor ji min re diyar kiribû ku divê ez vê yekê bi karkerên tenduristiyê re parve bikim, lewra ev peywireke mirovahiyê ye.

Zehmetiyên min kişandî têkiliya min û jiyanê zexmtir kir. Min giringiya tenduristiyê fahm kir û min ji bo vê yekê dest bi têkoşînê kir. Di encama têkoşînê de pozîtîv im, zewicandî me û bavê zarokekê me.

Ev heşt sal e zewicandî me, di dema dergistîbûnê de min ji hevjiina xwe re got ku ez pozîtîv im. Min nedikarî ew bixapanda, divê min rêza fikrên wê bigirta. Ew dem hevjiina min diçû mektebê, dev ji mektebê berda, dûre me mohra xwe birî. Di wê heyamê de ez pir fikirim bê ka ji hevjiina xwe re pozîtîvbûna xwe bibêjim an na. Rojekê min biryar da ku bibêjim. Em rûniştin. Min go “ez tiştêkî ji te re bibêjim lê belê bersiva te erênî an neyê be, çi dibe bila be ev tiştê min ji te re gotî divê di navbera me de be.” bi şerm û fikar min kulê xwe jê re got. Hevjiina min got ku ev di navbera me de nabe astengiyek e û ev yek dibe ku bê serê her kesî. Diyar kir ku vê rewşê han nikare rê li ber hezkirina me bigre. Ez gelekî kêfxweş bûm. Dûre min riskên derbarê vê rewşa xwe de jê re zelal kir, min got ku belkî zarokê me çênebe û min jê xwest ku baş bifikre wiha biryar bide. Hevjiina min di biryara xwe de zelal bû. Min nedixwest malbat wê bizanibe, hîna jî nizanin.

Piştî şeş mehên li ser zewacê derketim derveyê welêt. Bi wî perê ku min li wir kar kir, ez hatim stenbolê me dest bi tedawiya tûpê ya zarokçêkirinê kir. Encama vî karî dibe ku erênî be dibe ku neyinî be jî. Me encamên neyinî wergirtin. Ji bo ku cardin em karibin biceribînin ji hêla aborî ve, ez derketim derveyê welêt, min pere dan hev. Vê car li bajarekî din em çûn navendekî tûpê ya zarokçêkirinê. Min rewşa xwe ji wan re got ku hevjiina min negatîv e, ez pozîtîv im. Berî van karan hevjiina min operasyoneke biçûk derbas kir. Neha dotmîreke me ya bîst û yek mehî heye. Tu pirsgirêka wê ya tenduristî

nîne, di perîyodên sê-şêş mehî de kontrolên wê yên rûtîn hene. Êdî her kesên bi hev du re ger pozîtîv bibin jî dikarin zarokên bi awakî negatîv bînin.

Belkî ez ne înfektbûma min ewqas li gel jiyane tînedikoşî, ez bi ser gelek tiştan de nediketim. Hevjîna min berî zewacê dev ji mekteba xwe berdabû, piştî zewacê cardin dest pê kir; lê vê carê jî ji ber bêderfetiye aborî mecbûr ma dev jê berde. Heyama piştî înfektbûnê jiyana min sosyal û bergeha min li ser jiyane gelek guherîn. Aneha tiştê ku em bikin ew e, em ji dotmîra xwe re pêşerojê baş ava bikin. Ez wekî takekî bi HIVê dijî dikarim bibêjim: li gor demên berê pêvajoyên nexweşxaneyan di asteke rehetir de ne, pêşdaraziyên karkerên tenduristiyê kêmtir bûne, zimanê xerab ên medyayê jî li gor demên berê kêmtir bûne. Bêgûman di nav têkçûna vê fobiyê de keda mezin para xebatên komeleyên HIVê ne. Tiştên ku her carê tene gotin ez jî dixwazim dubare bikim: vîrûsa HIVê bi destê hev du girtinê, bi xwarina di heman masê de û bi gelekên mînakên bi vî rengî derbas nabe. Ne hewceye hûn hevza xwe ji kesên HIVpozîtîv bikin. Dikarin bişuxlin, bizewicin, perwerdehiya xwe bidomînin, bibin xwedî zarok. Di pêvajoya teşxîsê de min çavekî xwe wenda kir lê ne ji ber HIVpozîtîvbûnê bû, ji ber ku li nexweşxaneyê di dema xwe de dest pê nedan. Tu pirsgirêk nîne di wendakirina çavekî de, dikarim bişuxlim. Heta ku ez dikarim ji bo şuxlê derkevim derveyî welêt. Jiyana xwe didomînim. Keçeke min heye.

Hevalên min nizanin ku ez pozîtîv im, ne hewce ye jî bizanibin. Carinan dema bi hevalên xwe re dipeyvî mijara HIVpozîtîvê vedibe. Helbet ji ber ku nizanin HIVpozîtîv û AIDS ne heman tişt e, ne peyva HIVpozîtîvê peyva AIDSê bikartînin. Di navbera van axaftinan de ez ji wan re qal dikim ku min di kovarekî de di derbarê HIVpozîtîvê de tiştinan xwendiyê, HIVpozîtîv û AIDS ne heman tişt in, ez diyar dikim ku bê çawa derbas dibe çawa nabe. Mirov ji ser xwe bibêje zor e, lê bi mînakên wiha re ez dibînim ku pêşdaraziyên xelkê dişkê. Helbet mirov meroq dikin bê ez van tiştan ji ku derê hîn dibim. Ez diyar dikim ku di warê tenduristiyê de dilzîz im, ez lêkolîna li ser wan dikim, û ew jî dikarin lêkolînan bikin. Di navberê de li gel HIVê xwe li hember pirsgirêkên din ên tenduristiyê jî hestiyar û dilsoz hîs dikim.

Hevjîna Meçasu: Di wan deman de dema hevjinê min got ku HIVpozîtîv e, ji ber ku min nedizanî çî ye parikî tirs ket dilê min. Dema ez fêrbûm HIV vîrûseke çawane, min go “nikare ji hezkirina me re bibe asteng.” Di jiyânê de têkoşin û hezkirin dikare li hember her tiştî bi serkeve. Pêşniyaza min: pozîtîvbûn di vê jiyânê de ji bo tu tiştî ne asteng e. Binêrin hevjinê min pozîtîv e, em zewicandî ne, zarokeke me ya negatîv heye.

Wêne Wekî Filma “İncir Reçeli”* Ne Xerab e

Navê min Rûzgar e. Di îlona 2015an de hîn bûm ku bi HIVê înfekt bûme. Partnêrê min ê berê ji ber nexweşiyekî xwe divê emeliyat bibûya. Ew razandin nexweşxaneyê, berî emeliyatê divê hin testan çêkirana. Di encama testan de partnêrê min ê berê pozîtîv derket, li ser vê yekê jî rewşa xwe bi min re parve kir. Diyar kir ku wî bi xwe pozîtîv e û ji ber ku du salan têkiliya me hebû bi hev du re divê min jî testên xwe çêkira. Ji ber vê yekê min jî pêdivî bi testkirinê dî. Heya wê demê min tu carî test nekiribû. Di encama van bûyeran de hîn bûm ku pozîtîv im.

Dema min encam girtin, min xwe xerab hîs kir. Dema neyê serê mirov mirov zêde jî agahdar nîne. Heya wê demê jî min dizanibû ku HIV nexweşînek e, dema tu dermanê xwe bixwî dikarî tedawî bibî, hin geşedan hene li hemberî têkoşîna vîrûsê, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî HIVê ji kategoriya nexweşînên kujer derxistiye wekî rewşeke kronîk daye naskirin. Lê belê dîsa jî mirov pê diêşe bivê nevê, qonaxeke şokê dijî. Ji ber ku ji rewşa HIVê bêtir navê HIVpozîtîvê ya di civakê de xerab e. Vîrûs wekî nexweşîna “qehbikan” hatiye mohrkirin.

Pişti gotina partnêrê min ez jî çûm min test çêkir. Asayî mirov ji laboratorê digre encaman, ger ew negatîv be. Encama te pozîtîv be li

*Nişeya wergêr: Riçala Hejirê, navê filmeke tirkî ye.

wir tişteq nabêjin ji te re, berê te didin doktoran. Lewra ji min re diyar kirin ku divê ez doktora xwe bibînim. Ez çûm cem doktor, diyar kir ku ez pozîtîv im. Doktor jineke baş û fahmbar bû. Dema min bihîst ewilê min nekarî bertek nîşan bidim, di cihê xwe de tevizim. Min dizanibû ku ez ê nemrim û ger bi rêk û pêk kontrolên xwe bikim ew ê min nexe nav cihan, her wekî rewşeke vîral dê bimîne.

Ji ber pêşdarazî û bergehên civakê li ser HIVê tiştê yekem ku hat bîra min ev bû: “divê kes nizanibe pozîtîvbûna min.” Ji dêvla ku ez ê çawa xwe tedawî bikim, yekem tiştê ku hat bîra min ev bû: “divê kes bi min nehese ku takeke pozîtîv im.” Li pey wê pêvajoya tedawiyê dest pê kir. Doktora min ez sewkî nexweşxaneyê zaningehê kirim, ji wê rojê vir ye kontrolên min didomin.

Aneha malbata min rewşa min dizane, ewilî min bi xwişka xwe re parve kir. Min meyla xwe ya cinsî jî yekem car pê re parve kiribû. Ez mecbûr mabûm ku bi diya xwe re jî parve bikim. Di rojên ewil ên teşxîsê de min gelek derman dixwarin. Min rojê heft heşt heb derman dixwarin û veşartina dermanan ne gelekî hêsan bû. Bi awakî xwezayî [malî] derman didîtin. Rojekê min bi wan re parve kir lê belê bi vî şiklî: “Ev demeke dirêj e bi HIVê înfekte me, ev deh sal e wiha dijîm û ev vîrûs ji nexweşxaneyê derbasî min bûye.” Ji ber ku partnêrê min nas dikirin, ez fikirîm ger mijarê fahm bikirana dikaribûn bertek nîşanî wî bidin. Taliya talî nikarim wî jî sûcdar bikim, ger hay ji rewşa xwe bibûya, ew ê xwe biparasta û ew bi xwe jî bi vî şiklî hîn nedibû. Ji bo ku wî biparêzim min go ji nexweşxaneyê derbasî min bûye.

Di malbata me de ya herî dawî kekê min fêr bû, lê belê ne min jî kekê re got. Diya min ji ber tenduristiya min ketiye gumanê, fikir kiriye ku divê kekê min hîn bibe û ji bo ku kekê min lêkolîn li ser nexweşîna bike jî jê re gotiye.

Kekê min dizanibû berî bi salan demekê li Bodrumê ez bi hezkiriyê xwe yê îngîlîz re dimam, ji min re fikra xwe ya ku ji wî derbas bûbe, diyar kir. Hinekî bertek nîşan dida, digo: “Li malê zarok heye, tu li îskan û kevçiyên xwe miqate dibî.” Esil tu li kekê min binêrî ne

mirovekî cahil e, lê belê wiha difikirî belkî derbas bibe. Bi demê re ew jî li ser hûr bû, bersiva pirsên di serê xwe de dît.

Li hêla din, derdora min a nêz jî agahiya li ser tenduristiya min dizanîbûn, min bi wan re parve kir. Dema min bi hevalekî nêz î gey re parve kir ji masê rabû go “ez ê te hembêz bikim.” Rabû, me hev du hembêz kir, li wir tiştek negot. Çend meh derbas bû me cardin hev du dî. Go “dixwazim tiştek bi te re parve bikim.” Diyar kir ku ew jî pozîtîv e. Serê pêş min go jixwe henekan dike, dûre dema ji cizdana xwe dermanên xwe derxistin min jê bawer kir.

Di warê malbatê de ez tim difikirim, pir bi siûd im. Diya min homoseksuwbûna min li Bodrumê hîn bû, dema min û hezkiriyê xwe li wir bûn hatibû. Go “tu çi dikî bike, tu çawa bextewar bî bî ez bi wî awayî qebûl dikim.”

Sê mehê carek diçim nexweşxaneyê. Ev yek hinekî min aciz dike. Dema mirov xebatkar be, di derbarê destûran de an jî di derbarê meraqa mirovan de tengasiya mirov çêdibin. Ez derewên mîna “mebûrî, hin hejmarên xwîna min kêr in, ez li wan didim pirsîn” dikim. Ji ber ku ez nizanîm ew ê çawa bertek nîşanî min bidin. Di mijarê tîkiliyan de min xwe parikî da paş, ez nikarim nebêjim, dema mirov dibêje jî nizane wê çi bertek nîşan bidin. Aneha negatîv im, di xwîna min de HIV di astekê nizm de ne nikarin bêne tespîtkirin. Jixwe mirov dermanê xwe bi rêk û pêk bixwin piranî rewşa wan bi vî rengî ye. Ferqa di navbera heyama berê înfektbûn û ya neha de tenê ev e, ez zêde alkol venaxwim.

Hevalekî min bi yekê pozîtîv re diket tîkiliya neparastî li gel vê yekê jî li ber xwe dida ku test nede çêkin. Hergav min ew hişyar dikir di mijara hewcedariya testê de. Di demê pêş de ji ber pirsgirêkeke nexweşîne hîn bû ku înfekte bûye. Lê belê pozîtîvbûn ne asteng e ji tiştekî re. Neha hevalê min zewicandî ye.

Mixabin ji ber têgihîştina civakê ya negatîv li ser HIVpozîtîvê, em di saziyên ku xizmeta tenduristiyê werdigrin rastî van têgihîştinan tîn dem bi dem. Carekê di serdaneke welêt de ez çûn nexweşxaneyê.

Dema min xwîn da, gotin “tu yê bidî hemşîreya wê derê”, min jî wekî ya wan kir. Hemşîreyê, bêyî ku destê xwe dirêj bike go “deyne wê derê.” Min fahm kir ku naxwaze destê xwe li destên min bixe. Min go “nekeve gumanê dema tu destê xwe bidî tûpê derbasî te nabe.” Bersiv neda, ez bawerim bersivêkî ku bide nedît. Hevalê ku bîskek berê min go zewicandî ye, di wergirtin û qada xizmeta tenduristiyê de rastî neheqîyan hat. Ez van tiştan bi we re parve dikim ji ber ku hevalê min jî dixwaze pêşdarazî û îzolasyonên li hember me hatine avakirin divê bêne teşhîrkirin. Divê hevalê min emeliyat bibûya û ji doktor re diyar kir ku pozîtîv e. Doktor jî diyar kir ku ew ê wê emeliyatê pêkneyne, ew ê xwe û ekîba xwe nexe bin riskê. Me jî berpirsiyariyên wan bi bîra wan xist, me wiha diyar kir; çawa ku yek ji qezaya trafikê bê, bêyî ku zanibin pozîtîv e an na dikevin emeliyata wî/ê û mecbûr in xwe biparêzin bi wî rengî jî divê bi heman awayî biparêzin û vê berpirsiya xwe bi cî bînin. Lê belê bersiva wan wiha bû: “Aneha haya min jê heye.” Carekê jî, hevalekî min heye, dema hîn dibin ku pozîtîv e, ji pozîsyona wî ya berê dixwazin wî bigrin, bikşînin pozîsyoneke paştir. Hevalê min ew qebûl nekir, dev ji kar berda.

Em werin ser dabînkirina dermanan, ez dermanên xwe ji dermanfiroşê bajarê ku lê dijîm nastînim. Ez dermanê xwe ji dermanfiroşekî ji stenbolê didim şandin. Sedema jî ew e, naxwazim dermanfiroşê li warê jiyîna min hîn bibe. Lê belê carekê dema ji bo dermaneke dîtir ya nivîsandî çûm dermanfiroşê li bajarê xwe, di pergala *Medula* de kaxizên dermanên min li balê xuya dike. Dermanfiroş an jî kesên ku dermanan dabîn dike bi rehetî dikare bibîne pozîtîvbûna min.

Înfektebûna min bi vê HIVê di nav jiyana min de ji bo tu tiştî ne asteng e. Pêşniyaza min li mirovan di her qadê jiyane de li xwe miqate bin. Mirov seranserê emrê xwe her tim derman bixwe ew jî ne tişteki xweş e. Lê belê ger di jiyana wan de ev tişt hat serê wan jî bila netirsîn, guman nekeve dilê wan, şerm nekin. Pêşniyaza min ji kesên ku bi wan re dikevin têkiliyê re bila bibêjin. Wêne wekî filma *Încir Reçeli* ne xerab e. Mirov heya ku tedawiye red nekin, pirsgirêk nîne. Di wî warî de bi bawerîya min têgihîştin jî ber bi başbûnê ve diçe. Berî bi deh salan yek bihata bigota ez HIVpozîtîv im, dixwazim

bi te re şa bibim, ihtîmaleke mezin ez ê pê re şa nebûma. Bila kesên pozîtîv vederî jiyane nekin. Ev înfeksiyon ne cureyekî ji wan vîrûsan e ku bi xwarinê derbas bibe, bi destguvaştinê an jî ji destşoyê. Wek ku em dizanin Hepatit sed kat xurttir e ji HIVê di warê derbasbûyînê de. Ji dêvla ku mirovan bi HIVê bitirsînin, divê derbarê vîrûsan de bîn agahdarkirin.

Transeke Îranî ya HIVpozîtîv

Merhaba. Navê min Victoria Gandhi. Ez jineke Îranî ya trans im, li Tirkîyê dijîm. Berî ku ez bên ser rewşa xwe ya înfekdebûna HIVê, ez dixwazim derbarê LGBTÎbûna li Îranê hin tiştan parve bikim ku hûn yek ji van nasnavan bigrin ser xwe çî tê serê we.

Li Îranê piştî ku min pêvajoya xwe ya guherînê temam kir pê ve em pev dijiyan. Rojekê li cahda Valiasê dimeşiyam erebeyekê li ber min sekinî û polîsên şerîatê jê peya bûn. Xwestin min li erebê siwar bikin, min li ber xwe da. Polîsa jin a şerîatê şimaqek li min xist, bi kotekî ez li erebê siwar kirim. Ew roj sedema binçavkirina min porên min ên boyaxkirî, cil û bergên min bûn. Li Îranê gelek kes ji ber vê yekê dikevin binçavan. Li qereqolê gotin te karmendên me derb kiriye, ez mehkumî sê meha hepsê kirim. Dawiya sê mehê, min û hevjinê min sewqî dadgehê kirin, em her du jî hatin girtin. Di hepisxanê de em di karên gelek giran de dişuxilandin. Karê cilşûştinê dabûn min. Zivistanê bi ava sar min cil dişûştin. Demekê şûn de ji ber ku nexweş ketim ez kirim bin çavdêriyê. Doktora me jinikek bû ji ber ku jinan bi awakî îllegal kurtaj kiribû ew kiribûn hepsê. Gazinên min ji sermagirtinê bû; lê belê gotin di canê te de xwîn kême xwîn dan min. Li pey vê serhatiyê bi çend mehan di laşê min de birînên mezin mînanî pizikan derketin. Tehlîlên xwînê kirin, di encama tehlîlan de gotin dibe ku tişteki alerjîkî be. Neh mehê min di hepsê de bi vî awayî derbas bû.

Piştî berdanê li mala hevaleke xwe ya bi navê Roya mam, lê belê nexweşiya di laşê min de hîn jî dom dikir. Ji bo laşê xwe min sabûn û krêm ceribandin lê me tu encam jê negirtin. Laşê min hîn xerabtir dibû, pizik îltîhab ragirtibûn, veguhêzî bû înfeksiyonê. Doktorê dermatolojiyê go “dibe ku alerjîk be”, lê belê êdî înfeksiyon ketibû hemû canê min. Hevaleke min a bi navê Meryem ez birim cem doktorekî înfeksiyonê, li wir jî teşxîseke bi navê “ziziya havînê” danîn gotin canê te li hember germahiyê bertek nîşan dide. Min êvaran nedikarî rakevim, wek ku tişteki mîna derziyê di canê min de radibû. Em cardin çûn heman nexweşxaneyê, lê me cardin tu encam bi dest nexist. A dawî di testê labaratuwareke taybet de encam da ku ez pozîtîv im, min bi hînbûna wê re xwest xwe bavêjim bin erebeyan. Doktor diyar kir ku di vê jiyânê de dibe ku nexweşîneke taybet ya her kesî hebe, ew a hanê jî rewşa min a taybet bû. Min ji doktor pirsî bê ka ez kansêr im an na. Doktorekî gelekî baş bû, aşkere kir ku ez pozîtîv im. Ji helêkê ve digo ev jî wekî nexweşîna şekirê ye mirov li xwe miqate be tu pirsgirêk nabîne, ji hêlekê ve ez hembêz dikirim, morala min bilind dikir. Di odeyê de be ez û doktor bûn. Hevala min li ber derî bû. Piştî ku axaftina bi doktor re qediya, bi lez ez pengizim derve. Hevalê min li pey min bang kir: “Çi bû, çi dikî?” Ez lê vegeyriyam min go “ez AIDS im.” Di wê kêliyê de gira min diçû ji her kesî, min dixwest xwe bikujim. Dema aram bûm û vegeyriyam malê min fahm kir ku xwekujtin tu sûdê nade.

Ne pêkan bû HIV bi riya têkiliya cinsî derbasî min bûbe. Lewra têkiliyeke min a dirêj û bi yekkesî re hebû. Di heyama hepîsxanê de, piştî teşxîsa kê-m-xwînê, di encama xwîndayînê de vîrûs derbasî min bûbû. Berê jî min bihîstibû li girtîgehên Îranê tiştên bi vî rengî diqewimin. Dewleta Îranê dijminê gelê xwe ye, beleheq te davêjin girtîgehê, li hepîsxaneyê tu di encama tedawiyekê de dibî pozîtîv. Ger tu bikevî girtîgehên Îranê yan miriyê te dertê ji wir yan jî xisareke mayînde li te bar dibe. Di demên dawî de di xeberên ku ji girtîgehên Îranê tên diyar dikin ku di xwekujtînan de zêdebûn heye. Di eslê xwe de li wir kes xwe nakuje, têne kuştin.

Min giliya vê rewşa ku di girtîgehê de hat serê min kir, ji bo dijderketina min tu encam derneket bi ser de gef li min xwarin, diyar kirin ew ê ji malbata min re min aşkere bikin ku duwanzdeh sal bû ji wan dûr bûm. Pêvajoya min a nexweşxaneyê dest pê kir, bi demên diyar ez diçûm nexweşxaneyê min tehlîlên xwe dikirin. Li wir jî wek ya Tirkîyê min dermanên xwe bêpere digirtin. Li Îranê bi qasî şeş mehan ji milê min derzî li min dixistin lê belê li vir tetbîqeke wiha nîne. Dema ez çûm cem doktor bi riya wergêr min jê re got, doktor jî diyar kir ku aneha hewcehî bi wê yekê nîne.

Eyn wek li Îranê, li vir jî ji ber HIVpozîtîvbûna min kes li hember min bi xerabî tevnagere. Ez mijarê bînim ser mirovên derdora xwe, ne pêkan e heman tiştî bibêjim. Dema ez înfekte bûm û min ew bi mirovên derdora xwe re parve kir pê ve tu tişt weke berê nemeşiya. Mirovan ne ji bo ku demên xwe bi min re biborînin an jî ji ber ku bêriya min kirine li min gerîyan, sedema gerîna wan kontrol bû, bê ka ez mirime an na. Hevalê ku li cem wê dimam, yê ku ez birim doktor jî bi vî hawî tevgeriya. Ji hêlekê ve jî pêvajoya min dom dikir ku li saziyên dewletê li pey heqê xwe digeriyam. Her ku ez li heqê xwe digeriyam li Îranê jiyana min bêtir ket bin xetereyê. Dema min bi temamî hîs kir ku nikarim li Îranê bijîm, ew ê nehêlin ez bijîm min ji hevalên xwe yên trans alîkariya aborî xwestin. Di navbera xwe de pere kom kirin, hatina min ya Tirkîyê pêkan kirin. Li Îranê min jiyana xwe didomand lê pir ditirsiyam polîs min radestî malbata min bike. Ger radestî malbata min bikirana, dê malbata min ez bikuştama.

Ez ji ber van sedeman hatim Tirkîyê. Li Tirkîyê di yekem hevdîtina xwe ya bi saziyan re min diyar kir ku ez pozîtîv im. Ji bo ku baştir fahm bikin bê ez di rewşeke çawa de me, min şopên pizikan şanî kesên wê derê kirin. Pirs kirin bê min derman ji Îranê anîne an na. Min diyar kir ku têrî demekê derman hene li ba min. Di hevdîtinê de pirsîn bê kesên nas ên ji derdora Enqerê hene an na. Belê nasên min hebûn lê belê tu kes ji ber pozîtîvbûnê ez qebûl nedikirim. Diyar kirin ku dê min li Stenbolê bi cî bikin. Hatim Stenbolê, di mêvanxaneyekê de mam. Helbet min ji kesên wê derê re di derbarê rewşa de tu tişt negotin. Jiber ezmûnên xwe yên berê dizanim, ger bibêjim ew ê her kes ji min bireve.

Bi beralîkirina ASAMê* re klînîkek testên min dubare kirin, min dest bi dermanxwarinê kir. Li mêvanxaneya lê dimam yekî an dermanên min dîtibû an jî derbarê rewşa min de hin tiştan seh kiribû. Lewra vê yekê di nîqaşkirineke me de ji min re got.

Li Tirkîyê di pêvajoya min a nexweşxaneyê de heya neha min tu pirsgirêk nedîtin. Ez li Nexweşxaneya Şişli Etfalê tîm şopandin. Pêşî xwîn didim, du seat şûn de encamên min dertên. Dûre diçim dermanfiroşê dermanên xwe distînim. Lê belê li vir jî xwe ewle nabînim.

Dixwazim li Kanadayê bijim. Ji min re gotin mirov bi hêsantir dikare biçe Norvêç an jî Holandê. Norvêç û Holand helbet ji Îran û Tirkîyê ewletir in, lê li van welatan jî ji bo biyaniyan rê û rêgezên wan guherbar in. Ev der, Îran, Tirkîyê, em vana baş dizanin. Dema ku yek ji nasnavên LGBTÎbûna te bê zanîn kes te naxe şûna mirovan. Ev rastîyek e, tu jî dikanê nan bistîni jî, li nexweşxaneyê xwîn bidî jî yek e.

Li Îranê gef li min dixwarin ku min radestî malbata min bikin. Da ku malbata min min nekuje û ji bo ewlehiya canê xwe ez hatim vir. Dema ji Îranê derketim, tiştê ewil hat bîra min welatekî bû ku ewlehiya canê min û dermanên min dabîn bike. Ez herim Amerîkayê heft meh dê dermanên min bêperetî dabîn bikin wê dûre çawa be, ez ê çawa dermanên xwe dabîn bikim. Gotin li Tirkîyê Rêxistinên Sîvîl û Civakî hene piştgirî didin kesên pozîtîv, mirov dikare piştgirî ji van saziyan bigre. Ev tiştêkî gelekî xweş e, lê belê dema ez bi kesên mîna xwe re têkilî deynim mixabin xwe bêtir xerab hîs dikim. Li ASAMê min hevalekî pozîtîv nas kir, piştî guhdarkirina wî sê roj xew neket çavê min. Yekê pozîtîv min bi bîra min dixê û dema ez tîm bîra xwe psîkolojiya min xerab dibe. Ev bû sê sala teşxîsgirtina pozîtîvê, lê hê jî bi min ev yek ne qebulkirî ye. Çil salî me. Hin daxwazên min li ser jiyane hene, di vî warî de yekê pozîtîv baştir dikare fahm bike bê ez behsa çî dikim.

Vîrûsa HIVê bi riya tîkiliya cinsî derbasî min nebû. Ev vîrûs jî hêla dewletê ve li min hat derzîkirin. Belkî jî ji ber vê sedemê ye nikarim

*Rêxistineke Sîvîl û Civakî ye, li ser penaber bû penahendeyan dixebite.

qebûl bikim, nikarim daqûrtînim. Ji ber ku ez trans bûm ev yek anîn serê min. Tiştên ku dibêjim belkî ji bo we xeyalî be. Lê belê li hepisxaneya welatê min dev ji derbaskirina vîrûsan berdin, mirov di nav çardîwaran de tên kuştin û dibêjin wan xwe kuştine.

Hê jî ji ber ku xwe ewle hîs nakim nikarim bikevim pêvajoya qebûlkirin. Mesela ji vê şibakê hanê yek dikare bikeve hundir û min bikuje. Heya ku xwe ewle hîs nekim mecbûr im bi çavên vekirî rakevim. Helbet wekî her mirovî di jiyana xwe de ez jî dixwazim hin tiştan bikim. Ji bo tiştên ku dixwazim bikim jî tişte herî hewce ewlehî ye. Dixwazim herim cem hunermendan tiştinan hîn bibim, belkî tiştinan li ser kaxizê bikim. Berî hemû nasnavên xwe ez mirov im. Ji ber çî ez jî nebin mamoste an jî doktor? Em kesên LGBTÎ jî ber nebûna ewlehiya canê xwe, me dev ji welatê xwe berda hatin dûrahiyan. Ev rawestgeha em hatinê dişa jî ewlehiya canê me nîne. Derdên me neguherîn, heman e: ewlehiya canê. Ferq nake seatek emrê min jî mabe rojek emrê min jî. Di hawirdoreke wiha de ji dêvla ku bê ewlehî bijîm, kurt be jî ez ê cihekî ku aram û ewle bim tercîh bikim.

Ez Dikarim Zarok Ji Çêkim Karîyer Ji Lê Bikim

Merhaba. Navê min Ahmet e. Bi texmîna min ez di sala 2015an de înfekte bûm. Hevjîna min aneha ew dem hezkira min bû û di wê demê de em ji hev xeyidî bûn. Di wan deman de min xwe hinekî tarûmar kiribû, ketim têkiliyên neparastî. Bi texmîna min 2015 bû; lewra berî wê ihtimaleke wiha nîne. Berî wê min qet têkiliyên neparastî daneanî û min ne xwîn da ne jî stend. Ger ku ev ji hewa û avê derbas nebe...belê ji hewa û avê derbas nabe.

Min bi hevjinê xwe re li pey pêvajoya bi salekê li hev kir. Ê me biryara zewacê da. Dema me dest bi kirariyên zewacê kirin heftiya dawî ya sibata 2018an bû. Me ji bo zewacê test çêkirin. Piştî heftayekê li ser testan ji Miduriyeta Tenduristiyê ya Bajêr ve li min geriyan. Ez rast bikim, berî wê ji mala tenduristiyê ve ku min test li wir da çêkirin geriyan. Gotin “ji bo encama testên xwe divê hûn biçin Miduriyeta Tenduristiyê.” Min go “xêr e gelo pirsgirêkek heye?” Di vî warî de bi rastî jî ez personelê mala tenduristiyê ji dil pîroz dikim. Hemşîreya ku li min geriya bi dengê xweşkok, hevokeke eyn wiha saz kir: “Ez dibêm wek ku xwîna we tam neçûye, ango kêmasiyek qewimiye, lewma divê hûn ji nû ve xwîn bidin.” Min go “temam”, ez ji nişka ve çûm Miduriyeta Tenduristiyê ya Bajêr. Dema ez ghiştim wir, min trawmayek biçûk derbas kir. Hêj ew kêliya ketim wê derê, doktorê berpîrsê wir awirek da min, min fahm kir hin tiştên çewt diqewime. Diyar kir ku “ew ê ji nû ve xwîna min bigre”. Dema xwînê digirt jî

rasterast go “gelo di demên nêz de təkiliyeke te ya biguman çêbû gelo?” Go “em ê encamê ji we re bibêjin.” Min jî go “encam? yanî hûn çi bêjin? Hûn li çi dikolin?” Go “em nikarin neha wê bibêjin.” Min go “binêrin, zilamekî cahil û nezan nîne, têra xwe zilamekî bi mantik im, her tişt dibe, ez hazir im ji bo her tiştî. Bêjin bila bizanibim.” Diyar kir ku berî bi sî rojan nikarin bibêjin. Min go “temam” û li hevîna xwe geriyam, min go “ez aneha li Miduriyeta Tenduristiyê ya Bajêr im. Derbarê xwînên me de, difikrin ku di xwîna min de pirsgirêkek heye û cardin xwîn girtin. Û dê encamê piştî sî rojan bibêjin.” Ji nişka ve min du xwişkên xwe geriya û min ji wan re jî got. Yek ji xwişkên min gelekî bi şipl e. Rasterast ket Miduriyeta Tenduristiyê ya Bajêr, ji wan re eyn wiha got: “Ger hûn vê yekê ji min re nebêjin, hûn vê derê biqefêlin herin jî ez ê neçim, hûn sibehê werin hûn ê min bibînin. Hûn mecbûr in vê rewşê ji min re rave bikin.”

Ji xwişka min re encama tehlîlên min gotine. Di eslê xwe de ev jî şaş e, lê ji hêlekê ve jî ez xwişka xwe baş nas dikim, bêyî ku bersiva xwe bigre ji wir dervediket. Em rasterast çûn nexweşxaneyêke taybet. Me dixwest ji nişka ve teqezkirina testê bikin û test hat teqezkirin. Helbet li wir em ketin şokê. Yanî çi dibî bila be, tu bibî Polyanna jî li hemberî tiştêkî wisa şok derbas dikî. Dûre em ji nexweşxaneyê derketin, li kafeyekê rûniştin. Dema em li kafeyê rûdiniştin wekî ku tiştêk nebûbe min xwarin siparîş kir. Nava min û xwarinê gelek baş e, ez miriyê qirika xwe me. Pêşî min henekek eletewş kir. Ez nizanim bê çima min henekeke wiha kir, aneha pir diqehirim. Min hevokeke wiha saz kir. “Bisekne” min go, “nizanim ez ê çiqas emr bikim. Qe nebe heya saxî hebe her û her xwarin bixwim.” Hevîna min bi çavên kelogirî, bi awakî henekî jî go: “aneha em tam bûn Riçala Hejirê, baş e”

Dotira rojê em çûn nexweşxaneyêke din a taybet. Doktorek pêşniyaza me kirin. Dema ez çûm, li wê nexweşxaneyê hemû tetkîkên hûrgulî min da kirin. Li hemû tiştên di teşxîsa wê de hat venêrin. Serî pêşî, ya girîng hejmara kopiyên e. Hejmara kopiyên min hindik derketin. Diyar kirin ku ev ji bo min pêşwendiyek e. Û dûre şewirmenda min a hemtemenê min wiha got: “Bi nexweşxaneyê taybet re di vê riyê de nikarî bimeşî. Em navê yek du saziyên dewletê pêşniyaza te bikin, here cem wan.” Ez bi encamên xwe çûm yekem nexweşxaneyê ku

wan pêşniyaz kir. Doktor li encamên min hûr bû: “Di şertên asayî de ez di vê astê de dest bi dermanan nakim.” Lê belê Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê biryarek daye ku hema li pey teşxîskirinê êdî dest bi dermanan dikin. Min di 2ê adarê de teşxîs wergirtibû. Piştî bîst û pênc rojên li ser teşxîsê min dest bi dermanxwarinê kir. Pir balkêş e, ez bawerim psikolojîk e, dema min yekem dermana xwe xwar min go jixwe min nexweşinê têk bir. Dema min doza ewil xwar min go “ji min qediya.” Û qediya jî. Lewra min gelek lêkolîn li ser dermanê kiribû. Aha di vê xalê de ez bes tiştêkî dibêjim, agahiya şaş bi rastî jî mirovan ber bi xemgîniyeke dijwar ve dajo. Mesela di derbarê vê dermanê de yekem tiştê min bihistî ev bû, bandorên li gel wê gelek in: wekî mahdxelîn, bi şev şiyarbûna kabûsan, bêhalî, dilneçûyîni. Min yek ji van bandorên li gel dermanê nedîtîn. Ji roja ku min dest bi dermanê kir pê ve min xwe ewletir, aramtir û bextewartir hîs kir. Piştî xwarina dermanan bi bîst û pênc rojan dema doktor cardin gazî min kir bo kontrolê, hejmarên min daketibû asteke ku nikare bêpîvan, ez negatîv bûm. Doktor got: “hejmara te ya kopiyan kêmbûn, lê belê di demekê wiha kin de hejmarên te ketibe asteke ku nikaribe bê pîvan, yanî daketina te li hejmarên negatîv gelekî girîng ji bo me. Piştî bi mehekê li ser daketina bin negatîvê ez zewicim. Wekî encam tu planên me taloq nebû. Hevjîna min bes vê yekê got: “Ger tu rojek jî bijî ji xwe tiştêkî wiha nîne, belê ez ê bi te re bizewicim û bi vî hawî ez ê jiyana xwe dewam bikim.”

Tenê du xwişkên min, hevajîna min û midurê min pê ve tu kes vê rewşê nizanin. Bertekên ku xwişkên min dan ew ê nebe agahdariyeke sûdewar lewra ez birê wan im. Her çi dibe bila be, li vê derê naxwazim kategorize bikim, bila şaş neyê fahmkirin. Ez yekî bikujim jî ew ê xwişkên min min bixin bin çeng û berên xwe. Û ev cihanbiniya wan û bertekên wan naguherîne. Midurê min gelekî bi xweşikî nêzî meselê bû, go “ez dizanim ew çi ye. Ew jî ji ji xwe wekî tê gotin, bi vexwarinê, bi destguvaştinê, bi wê an bi vê derbas nabe; carinan dibe ku bi riya têkiliyên cinsî derbas bibe û kesekî ku dermanxur bi awakî neparastî bikeve têkiliyê jî derbasî yeka din nabe.” Ev ji bo min tiştêkî bêhempa bû. Ji yekê derveyî malbata min û ne ji yekê HIVpozîtîv dema min ev gotin bihistin gelek kêfa min anî.

Dema em ji bo van demên xwe bibêjin; ne hêsan e mirov rewşa HIVpozîtîvbûnê bi kesên din re parve bike. Ji bo van demên me hêleke wê ya tirsnaq heye. Lê belê hêla wê ya tirsnaq qet ne ew bertek in ku nişanî min bidin. Ev tişt min ditirsîne: ez zilamekî wiha me li gor encaman dijîm. Ger ez nikaribim ên li hemberî xwe qanîh bikim, ev tişt hêviyên min gelekî dişkênin. Ger hîs bikim ez ê karibim qanîh bikim bi dilekî rehet ez dikarim ji her kesî bibêjim.

Em werin ser zarokçêkirinê; kesê ku tedawiyê dermanê bike û asta wê negatîv be bi riyên normal jî dikare bibe xwediyê zarokan. Tu fikareya wê nîne e. Ji ber ku ji xwe ne pêkan e hûn derbasî yekê din bikin. Bi awakî neparastî hûn dikarin bi hevjiña xwe re bikevin təkiliya cinsî, bi riyên asayî bibin xwedî zarok. Lê belê me rêbaza aşikirinê hilibijart. A rastî, hûn biçin klînîka biçûçik jî, nexweşxaneyê herî luks jî vê yekê pêktîne. Ji ber ku karekî pir hêsan e. Bi vî şiklî me aşiya xwe da kirin. Aşikirina me ya ewil cihê xwe negirt, lê belê me nego bes. Me go demildest em ê mehek şûn de cardin biceribînin. Di dawiya mehekê de dema me cardin ceriband aşikirina duyemîn cihê xwe zevt kir. Di hemlûnê de, hevjiña min çar an pênc mehî bû, me go çi dibe çi nabe em testê bikin, tu tişt derneket. Zarokê me çê bû. Piştî çêbûna zarokê deh roj şûn de me test da kirin, di wir de jî problem tune bû.

Gelek girîng mirov zanibe bê çi dixwaze di vê jiyânê de. Piştî teşxîsbûna xwe min jî dikaribû tiştêkî wiha bikira... Ji hevjiña xwe re negota. Jixwe hevjiña min ne ji wan kesên sergerm bû derbarê zewacê de. Min ê riyek bidîta wê ji zewacê sar bikira, min ji xwişkên xwe re jî negota bi tena serê xwe min jiyana xwe bidomanda. Haya kesî jî ji min nedibû. Aha ev giş bi daxwaza mirov ya li ser jiyanaê ve girêdayiye. Bi van tiştan ve girêdayiye; bê ka mirov çiqas ji derdora xwe bawer e û mirov li gel te çiqasî zexm û xurt in. Min di vê warî de piştgiriyeke bêhempa dît. Hevjiña min dikaribû bigota: “Qisura min nenêre, ez gelek ji te hez dikim lê ez nikarim bi tiştêkî wiha re bijîm.” Ez mecbûr dibûm hingê rêza vê yekê bigrim, min nedikarî tiştêk bibêjim. Lê belê wê tiştêkî wiha nekir.

Baş e ku min jî riyeke wiha hilnebijart, bi tirs nereviyam. Bes çend caran tiştên wiha hatin hişê min: gelo ev mijara zarokê dibe ku bi risk be? Dûre min go tu çi dibêy lo. Baş e ku di mijarê zarokê de heya dawiyê me sebr kir. Neha zarokê me sê mehî ye, sihetxweş e. Jiyanekê pîr bextewar dijîm, pîr xweşik dijîm. Vê bûyerê di jiyana min de tiştên bêhempa li min zêde kirin. A rastî, dikarim bi awakî pozîtîv li her tiştî binêrim. Yanî li hember her tiştî ez vê yekê dibêjim...Mesela tiştêkî neyinî min dîtî. Dikare bandorek li derdorekî bike, lê bandor li min nake. Ji ber ku dibêjim “dema te 2ê adarê de teşxîs girt, tu tîkneçûyî, nereviyayî, te ji xwe re xwarin xwest. Gelo ev ê te tîk bibe.” Bi vê gotinê re ez hewl didim li hember tiştê hatiye serê min tîbikoşim. Ger vî tiştê hanê ez tîk nebirim dibêjim, dema dibêjim ez tîk nebirim, binê wê xêz dikim ku ev ne tiştêkî hilweşîner e.

Tiştêkî nenas dema pêşkêşî we dikin, belê ev ji bo we gelekî tirsnak e. Ez, ji ber ku dizanim bê ew çi ye di vî halî de me. Lê belê ew dem min nedizani. Di şertên asayî de divê ez tîkbiçûma. Yanî gelek tiştan li min zêde kir. Bandora wê ya li ser jiyana min bes ev e, her roj seat heşt û bîstan lazim e dermanek bixwim. Di vê navberê de, ev gelekî girîng e, divê her kes dermanên xwe bi rêk û pêk bikarbîne. Yanê min îro piştî xwarinê xwar, îro berî razanê bixwim, îro nîvrokî bixwim... Na, tiştêkî werê nîne. Ev ji xwe ji bo antîbiyotîkan jî wisa ye. Di telefona min de alarm sazkerî ye, bîyî dermanê xwe bixwim naçim dikanê jî. Dibe ku ev paranoyî be. Lê belê tim bi vê mantiqê tevdiagerim; ez çûm dikanê, min hevalekî xwe dî, go were em qehwakî vexwin, em rûniştin, min qahwe vexwar sohbet dirêj bû. Lewra vê [dermanê] li gel xwe wekî hestê, wekî pakêta cixarê bigerin. Her tim li cem min in.

Dema di rêza bendemayîna doktorê de li nexweşan dinêrim ji ber min diçin, berê ji bo min tu mahneya wan nîn bû, tevde nexweş bûn ji bo min bes. Min dîgo “Xwedê şîfa bide wan.” Min dîgo Xwedê alîkarê wan be, min rûyê xwe ji wan dida alî. Lê belê, li xwe vedigerim, li xwe dinêrim. Zilam di sendeliya biçerx de dilê xwe di destê xwe de bi xwe re digerin. Difikirî? Dilê xwe di destê xwe de digerin. Ez du sal bi periyodên sê mehî diçim nexweşxaneyê, min heya neha tu pêşdarazî nedîtî. Lê belê ev nayê wê mahneyê ku di pêşerojê de ez ê nebînim.

Ez mînaekeke qerfî bidim li ser xwe. Hefteya ku ez hînbûm, dema li metrobusê siwar dibûm min destê xwe nedida tu derî. Sedema wê jî ev bû, dibû ku min tiştêkî din jî bigirta, bila ew jî lê zêde nebe. Berî înfekdebûnê ez zilamekî hingî sosyal bûm nayê gotin; sebra min li malê nedibû, ji konsertekê diçûm yeka din, ji partiya malan diçûm yeka din, zilamekî ger gerok bûm. Piştî înfekdebûnê jî tu tişt di jiyana min de neguherî. Mesela zilamekî alkolnaxur im. Hevalekî min ku hay ji min heye, go “gelo ji ber wê [nexweşînê] ye”. Min go qet eleqa wê pê nîne. Qet eleqedar nîne. Bes hez jê nakim. Canê min hilnagire.

Di warê xwarin û vexwarinan de li gor berê bêtir miqate me. Gotinek heye dibêjin “nexweşînên kêlekbir.” Ger hêza min a immunî bikeve rîska ku tu bi wan nexweşînên kêlekbir bikevî zêdetir dibe. Çi ne ew? Grîp. An jî tu nav lê bike. Hewl didim hêza xwe ya îmmunî xurt biparêzim. Tiştêkî teqwiye nakim. Bes bi rêk û pek li xwarina xwe miqate dibim. Strêse bi temamî dûrî jiyana xwe dikim. Ez li cem tu dever û mirovên ku li ba wan nerehet im û min bixe strêse naseknim. Ez dixwazim bi wan kesan re ku sudeya wan li min dibe û sudeya min li wan dibe, em hev du bibînin. Di serî de ev mijar... pê ve, berê ez diketim sohbetên gelek vala. Hevalên min ên jin, hevalên min ên mên hebûn ji hezkiriyên xwe veqetiyane, heya sibehê di milê min de digrin. Êdî di civatên wiha de cih nagrim. Ji ber ku êdî pirsgirêka te, dema mirov bi pirsgirêkên din ên derveyê dide ber hev du ya te nakeve kategoriya pirsgirêkan jî. Ji bilî van, dikevim hemû derdorên ku sudeya min bigihije min û kesên li gel min. Di warê sosyal de tu guherîn nîne. Tiştêkî ku êsktra bala xwe bidimê nîne.

Belaeks kêmkirina ji hin tiştan, min gelek tiştên xweş ezmûn kirin ku min nedikarî xeyala wan bikim. Zewac, zarok, kar, kariyer... Gişt wekî gilokê kom dibe, bi xweşbûyîni dewam dike.

Berî her tiştî bi hemû dilsoziya xwe dibêjim, dema we ew teşxîs girtin, wê şokê bijîn, wekî keran bizirin, bêjin çû ji min. Ger hûn vê yekê di wê kêliyê de nekin, dûre teqez dertê pêşiya we. Wiha bifikrin: ger hûn pirsgirêkên xwe û hevjiha xwe, hevalên xwe, midurê xwe yê li kar, hevalên xwe yê kar bixin bin xalîçeyan, rojek tê ew teqez ji bin xalîçeyan dertê. Pêvajoya teşxîsê tiştêkî wiha ye. Sezen Aksu çiqas

xweş gotiye: “heya ku jehr dernekeve derve, dil nayê şuştin.” Ji ber vê yekê tu jê dawerivîni derve, dûre tu yê bêji ji neha şûn de ez ê çî bikim.

Ez dikarim pêşniyaz bikim, nexweşxaneyê herî baş Nexweşxaneyê Zanîngeha Weqfa Beziâlem e. Doktorên wan mirovên bêqisur in. Doktora min a her daîm, her ku di izna zayîni de bû dîsa jî telefona xwe da min, navnişana maila xwe da min. Go “tu biçî doktorên din jî tu dikarî encamên xwe ji min re bişîni.” Wiha tiştê ku te ji jiyane sar bike nîne. Û piştî wergirtina teşxîsê feylesofîyê wiha min saz kir, pir klîşe û gelekî rast e jî: ji ber vê teşxîsê emrê kesî nayê kutkirin, lê divê em her rojê xwe wekî roja dawî bijîn. Sedemê vê yek bes ev e, tiştên ewqas xweşik hene, min piştî teşxîsê dît ku me çavên xwe ji gelek tiştên xweş re girtiye, dûre min ên xwe vekirin.

Derman pir buha ne. Qutiyeke wê du hezar lîre ye. Kesên ji ewlehiya sîgorteyê bêpar bin, siûda wan kêma di dabînkirina vê dermanê de. Hin mirov hene nikarin mehê pêncî lîre jî bidin. Dev ji pêncî berde hin mirov hene nikarin lîreyek jî bidin da ku nanek bistînin. Kesên xwedan sîgorteyên taybet a tenduristiyê hene, ger fahm bikin we teşxîseke wiha girtiye peymanên xwe betal dikin. Dibêjin em ê heqê vê yekê nedin. Em bêjin tu li şîrketêke sazkar dişuxlî û kargeha we sîgorteya taybet a tenduristiyê ji bo we çêkir, ev sîgorteya taybet a tenduristiyê salê carekê polîçeya we nû dîke. Her sal dema polîçeyên we tê nûkirin, Miduriyeta Tenduristiyê ya Bajêr, ji SGKê [Saziya Ewlehiya Sosyal] agahiyên derbarê we de vediguhêze, bê sewt û sewal.

Ez di vî warî de bisiûd im. Ev duwanzdeh sal e li heman cihî kar dikim û sîgorteya taybet a tenduristiyê ji bo min bi xerantiya heya dawîya temenê hatibû çêkirin. Piştî pênc salan hûn xerantiya heya dawîya temenê xwe bi dest dixin. Piştî pênc salan bê sewt û sewal her sal jixweber nû dibe. Pêşwendiyê min a wiha heye. Yanê dixwazim bibêjim sîgorteya taybet a tenduristiyê rîskeke mezin e. Di saziya me de hevalekî min î gelekî nêz ji ber ku nexweşîna şekirê pê re heye polîçeya wî nû nekirin.

Ew çend pozîtîvbûna her tiştî parikî ji ber min e, parikî siûda min e û parikî jî ji ber malbata min e. Hevjîna min di vê mijarê de ji min

bêtir xwedî zanînê ye, ji min bêtir çalak e. Lewra ez û hevjinê xwe em dixwazin piştgiriya wan kesan bikin ku nû rewşa xwe hîn bûne.

Carinan Awirek Ji Hemû Heqaretên Li Ser We Girantir Dibe

Merhaba. Navê min Zohre ye. Ez jineke trans û penaber im. Ji ber zextên malbat û civakê mecbûr mam ji welatê lê dijîm dûr bikevim. Ji ber ku ewlehiya canê min tune bû û tûşî gelek zextan bûm hatim Tirkîyê. Pirsgirêkên ku min li welatên xwe dîtî li vir jî dibînim. Bavê min fahm kir ku têkiliya min bi yekî re heye. Di rojbûna min de min û yekê ku pê re şa bûbûm wêneyek girtibû. Wî kesî dûre ew wêne şanî malbata min dabû. Malbata min tim zirarê da min. Carekê bavê min hewl da ku min bi ava keliyayî bişewitine. Dema min xwest ji destê wî rizgar bibim li canê min ket. Yek du caran jî hewl dan ku min bikujin. Ger wê kêliya wêneyên min hatin parvekirin malbata min ez zevt bikirama ew ê min bikuştana. Piştî hatina min hê jî gefên malbata min bi dawî nebûn, gefên mîna “em te zevt bikin em ê têzav li rûyê te bikin” hê jî berdewam in. Ger ez li welatê xwe bimama teqez dê malbata min ez bikuştama.

Li welatê xwe min çar salan leşkerî kir ji ber ku her carê ez ji cihê xwe yê leşkeriyê direviyam, dema dihatim girtin leşkeriya min wekî ceza dirêj dibû. Bifikrin, di navbeyna çar sed mêran de tu jin î.

Ez mecbûr bûm bi riyên qaçax ji welatê xwe derkevim û cihê herî hêsan ji bû çûna min jî ev der bû, ji ber wê li Tirkîyê me. Ji ber hin tiştên li vir hatin serê min, min dixwest bi riya qaçax ez ji Tirkîyê herim welatekî din. Serê pêşî min qeyda xwe bo NYê nekir. Ez difikirim ku vir ji welatê lê dijiyam baştir bû, min go hinekî bişuxlim,

pere bidim hev du, bi riya qaçax herim welatekî din. Lê belê li vir piştî pênc mehan qet perê min nema. Min fahm kir ku bes xeyalek e tu bi şuxl û bi komkirina perê re bi riya qaçax biçî. Dûre gotin tu dkarî serî li NYê bidî da ku te bişînin welatên sêyemîn û min jî qeyda xwe ya NYê çêkir. Min digo qey ez li Tirkîyê bi rehetî dikarim bişuxlim û bi rehetî bijîm. Lê belê dûre min fahm kir ku ev der ne derekî wiha ye. Nikarim bijîm, nikarim bişuxlim û nikarim bimînim. Li welatê xwe belkî yek du kes bihatana alîkariya min li vir ew jî tune. Aneha di rewşekî ecêb de dijîm, cihê ku min xwe gihandê ji cihê ku jê hatime xerabtir e.

Li welatê xwe ji ber ku zextê civakê pir bû min xwe vedişart. Lê li vir ji bo min bes karek heye karê seksê. Li vir li restorantekê şuxilîm, ez ji wê derê avêtim. Gotin “tu ne li gor van karan î, ji bo karê din çi dixwazî?” Min xwe gelekî xerab hîs kir di wê kêliyê de. Lewra min nedixwest karê seksê bikim. Hê jî naxwazim bikim lê li vir ji bo ku karibim bijîm mecbûr im karê seksê bikim. Ez li xaniyan digeriyam û min bangewaziyek belav kir li ser înternetê. Ji nav kesên ku li min vegeeriyam yekî wiha go “tu kirê nede!” Dema min go “ew çi ye, ez kirê nedim”. Go “em dikarin bi riyên din hev safî bikin.” Ew dem min fahm kir ku li vê derê ewlehiya min nîne. Li welatê xwe dema destdirêjî li min bû ew kêlî min dikaribû biqîrim, hinekan dikaribûn bihatana hawara min lê belê li vir min nedî kesî hat hawara min. Mesela li vir yek serê yekî jê bike, “wî ev heq kiribû, ev heqê wî bû” dibêjin.

Li vir dema karê min ket cem saziyên dewletê ew karê min tim hat kirin. Lê tiştê ku behs dikim ne polîs e. Carekê polîsan ez derb kirim. Min dixwest derdên xwe bibêjim, ew bes digotin “hiş be qehbik, hiş.” Ji ber ku li vir me bes wekî qehbikan dibînin. Ne ji ber penaberiyê ne ji ber transbûnê. Ev nêrîn di malbata min de jî hebû, di civaka min de jî. Li vir tu kes wekî mirovatî têkilî bi min re daneanî. Kesên ku hewl didan nêzikahiyek ava bikin jî, bi demekê şûn de gotin “tu çiqas dixwazî.” Ger hîn bibin ku tu trans î her kes dixwaze te ji mala xwe bavêje jixwe. Heta ku hinek kes li vir te naxin markêt û mexezeyên xwe jî, naxwazin te bixinê. Polîs li vir te naxe bin parastinê. Ez qet naxwazim li Tirkîyê bimînim, ez dixwazim herim cihekî ku min wekî mirov qebûl dikin, navê wî ne girîng e. Divê her kes vê yekê

fahm bike, li Tirkîyê nemaze ewlehiya transan nîne. Lewra ne pêkan e transek karibe xwe veşêre, li vê derê hahanka ye transek rûberî destdirêjî an jî mirinê be. Ew ji bo Tirkîyê jî îmajêke xerab e.

Ji bo ku karibim jiyana xwe berdewam bikim carinan mecbûr dimînim karê seksê bikim. Min dest bi vî karî kir û şevekê tiştê hat serê min. Bi awakî dijwar nexweş ketim. Diçûm doktor jî baş nedibûm. Ew dem ji ber ku perê min tunebû bêparastin diketim tşkiliya cinsî. Ez mecbûr bûm wiha bikim. Biqasî heftakê agirê min gelek zêde bû, yekem tiştê hat bîra min wergirtina HIVê bû. Bi awakî nexweş çûn NYê. Min go “pirsgirêkeke min a lezginî heye û ez gelek nexweş im. Çûyîna welatê sêyemîn ji bo min ne tu tişt e aneha, di derbarê vê yekê de dixwazim bi we re bipeyvim.” Navê nexweşîna min pirsîn, min diyar kir ku nizanîm. Min diyar kir ku piştî vegera xwe ya bajarê lê dijîm ez ê tehlîl bidim kirin. Min dubare kir ku trans ji ber dirûvên xwe bêtir pirsgirêk dikşînin û divê ji wan re cudaxwaziyeke pozîtîv bê danîn.

Ez vegeyriyam bajarê ku lê dijîm, ji tehlîlên xwe negatîv derketim; lê belê hat gotin ku di cigerên re pirsgirêk heye. Dûre min fahm kir ku li Tirkîyê nexweşînekê ji HIVê xerabtir heye, ew jî êşa zatore ye. Naseke min a trans hebû, HIVpozîtîv bû, bi rêk û pêk derman nedixwar. Ji ber HIVpozîtîvê hêza wê ya îmmûnî qels bû, bû zatore, ji zatoreyê mir. Min tehlîlên xwe da kirin û ew pêvajoya bendemayîne gelek xerab bû ji bo min. Piştî zatoreyê, li vê derê hevalên min ên LGBTÎ ên penaber alîkariya min kirin. Lewra ez pir nexweş bûm, ditirsîyam ku bibim HIVpozîtîv û min nedikarî karê seksê jî bikim di wan deman de. Her ku ez li ser HIVpozîtîvbûnê difikirim morala min xera dibû, digiriyam. Min nekarî ji hevalên xwe re bibêjim, min baş dizanibû ku ji ber nezaniyê êdî ew ê bi min re nan jî nexwin. Bêyî ku bibim HIVpozîtîv min rewşa HIVpozîtîvê ezmûn kir di hundirê xwe de. Ez baş fahm dikim kesên pozîtîv çî dijîn.

Hevaleke min a nêz pozîtîv bû, ez neha wî/ê baştir fahm dikim. Min nekarî yek ji hevalên xwe re jî gumanên xwe bibêjim, lê belê her kesî ew dem ji min û ji halê min ê ruhî ditirsîyan. Wekî din, pirsgirêkeke min a din jî hebû, di vê heyama nexweşketinê de di laşê min de hin

leke peyda bûn. Her kesî ji vê rewşê ditirsiya. Ew dem cihê min ê mayînê nîn bû. Ji ber ku min nedikarî bi rêk û pêk laşê xwe paqij bikim kuvarik di laşê min de şîn hatibû. Loma bi riya gotegotan her kes wiha digo qey ez HIVpozîtîv im. Di heyama bendemayîna encamê de min fikra wê dikir, digiriyam. Di serê min de tiştên wiha derbas dibûn: Ez bûm HIVpozîtîv û ji ber vê yekê wê tu kes têkilî bi min re daneyne, di vê jiyânê de bi temamî ez bi tena serê xwe bimînim. Ez wan fikrên wê demê bi aşkere bibêjim, min ê xwe bikuşt. Lê belê di demek kin de min fahm kir ev fikir jî şaş e. Ger min bi xwe ezmûneke wiha derbas nekira, yek bihata cem min bigota ku HIVpozîtîv e ez ê ji cem wê bireviyama. Mala min hebûya min ew nedixist mala xwe, lê aneha ez hevalên di vê rewşê de hembêz dikim, piştî wan digrim. Di vê jiyânê de mixabin em bêtir ji wan tiştên nenas ditirsin. Min fahm kir bê HIVpozîtîv çî ye û bi vê yekê re min di ku pêşdaraziyên me beleheq in. Li pey vê pêvajoyê di derbarê HIVê de hewl didim hevalan agahdar bikim. Û êdî ji HIVê natirsim.

Di vê navberê de piraniya kesan jî ji ber nezaniyê, ji ber tirsên xwe, herku pozîtîv in jî xwe wekî negatîv dizanin. Li welatê lê dijîm ez rastî kesên pozîtîv dihatim lê min dît ku li vir zêdetir in. Kes naxwaze li vir pere bide kondoman, mişterî kondom hebe jî naxwazin bikarbînin. Li vir karkerên seksê jî, mişterî jî, hezkiriyên daîmî jî di warê bikaranîna kondoman de ne xwedî zanîne ne. Ez wekî transeke ku jiyana Rojhilata Navîn dîtiye dikarim bibêjim, li welatê min bikaranîna kondomê ji Tirkîyê zêdetir berbelav e. Hûn wekî kesekî Tirkîyeyî dema xwîn bidin kes bi çavekî xerab li we nanêre, xwîna we digre diçe. Li vê derê dema ez diçim beşa înfeksiyonê bo xwînê bidim, ji ber ku ez penaberekî trans im yekcar dibêjin ev qehbik e. Cihê ku ez çûm xwînê bidim, her kes bêpirsgirêk xwîna xwe da. Dema dor hat ser min min dît ku her kes li min dinêre. Hingê min go ji xwe ez pozîtîv im û her kes vê yekê dizane. Li wir hin kes hene tiştinan digotin, baş an xerab, ji ber ku tirkî nizamî min fahm nekir. Carinan awirek ji hemû heqaretên li ser we girantir dibe. Ez wekî kesekî ku demekê karê seksê kiriye aneha xwe bêtir di ewlehiyê de hîs dikim û naxwazim karê seksê bikim. Li Tirkîyê nemaze bikaranîna kondomê ne berbelav e. Loma divê kondom bêpere be ku her kes karibe xwe bigihîne.

Ji Bo Ku Tu Li Xwe Miqate Bî Ne Hewceye HIVpozîtîvî Bî

Merhaba. Navê min Baran e. Ez hunermend im. Di heman demê de di komeleyekê de bi dildarî dixebitim. Di hemû xebatên xwe de hewl didim bo sosyalbûniyê, mirovan binîm cem hev.

Piştî hînbûna HIVpozîtîvbûna xwe tu tişt neguherî. Dema difikirim, ji xwe tiştên ku min ji bo mirovan dikir aneha ez wan tiştan ji bo xwe dikim. Ji ber vê yekê jî dikarim bibêjim qet têsîr li jiyana min a sosyal nekir. Ew dem min di saziyeke navneteweyî de bi awakî profesyonelî dişuxilîm. Cihê ku ez şixulîm di vî mijarê de cihêkî xwedan hişmendî bû.

Dûre li saziya ku ji damezrîna wê pê ve ez li wê derê bûm min xebatên xwe domandin. Pêvajoya hînbûna HIVpozîtîvbûna min ji bi riya hevalekî çêbû, li min geriya diyar kir ku mirovê ez pê şa bûbûm HIVpozîtîv bûye.

Dema ez hîn bûm ku ew kesê berê em pevşabûne HIVpozîtîv e, ez jî çûm bo test bidim çêkirin. Berî demeke kin bû, têkiliyeke biqasî du mehan lê belê dîsa jî hewce bû min test bidaya çêkirin. Balkêş e di rê de li hevalekî rast hatim ku *Komeleya Pozîtîf Yaşamê* wekî psikolog dixebite. Hevalê min tirsra li ser rûyê min fahm kiriye, dema pirsî bê ez baş im an na, min bes jê re go “ez nikarim aneha ji te re bibêjim.” Dema pirs kir: “tu HIVpozîtîv î?” min go “nizanim, aneha diçim testê. Piştî vê gotinê ez kişandim quncikekê. Go “tu dizanî ku

ev ne tişteki tirsnak e. Tişteki kontrollirî ye. Ez dikarim bibêjim piştî axaftina me ye kurt jî serê min parikî rehetir bû.

Ez çûm klînîkeke taybet û li wir test da çêkirin. Di bendemayîna testê de li salona bendemayînê monîtore agahdayîne hebû. Di monîtore de li ser riyên derbasbûyîna HIVê vîdyoyek dihat nîşandan. Bi ya min vîdyoyeke gelek serketî bû. Wekî henekan e, esil em piştî înfekcebûnê wan vîdyoyan dibînin. Xwezî ev navendên tenduristiyê, nexweşxane van vîdyoyan ne tenê di saziyên xwe de li saziyên derve jî van vîdyoyan bidin nîşandan, riyên cuda yê agahdayîne bibînin.

Vê bendemayîne gelekî balkêş bû. Pêvajoyeke wiha bû ji bo min, wekî ku tu li benda çêbûna zarokekî bî. Ji hêlekê ve jî dema bi awakî erênî li rûdanan dinêrim, ez li pey pêvajoya HIVpozîtîve haydar bûm. Encama testa *Elisayê* pozîtîv derketibû. Hinekî tirsiyabûm. Ji bo teqezkirinê min cardin xwîn da. Ji bo encama teqezkirinê lazim bû çend hefte li bendê bimînim. Di wê pêvajoyê de, tim min bi xwe ji xwe re digot dibe ku HIVpozîtîv bim an nebin lê ihtîmaleke mezin ez pozîtîv im.

Aneha dema mirov difikire wekî ku zarokek çêbûbe. Ji ber ku tu vê rewşê hanê di hundirê xwe mezin nakî, tu dest pê dikî pê re diji. Ger hûn bipirsin piştî HIVpozîtîvbûnê tişteku guherî di jiyana te de, hema hema tişteku neguherî. Dikarim bibêjim bi giştî ez zêde li tenduristiya xwe miqate dibim. Jixwe ez mirovekî wiha me, ger civatek hebe min bîra vedixwar, car bi car jî cixare dikşand.

Dema teşxîsa HIVê teqez bû min bi hevalê xwe re parve kir û ew jî gelek heyirî ma. Him di mijarê homoseksuweliyê de him jî di mijarê HIVê de bertekên giran nîşan da. Dema mirov vîrûsê digre nav laşê xwe, dema dibe kirdeya wî karî hin tiştan zûtir qebûl dike. An jî ez dikarim bibêjim ji bo min wiha bû. Zêde dem jî bi ser de neket, ev nêzî du salan e ez HIVpozîtîv im.

Ji ber ku li derdora min gelek kesên pozîtîv hebûn demekê min go qey tişteki xwezayî ye bi min re jî hebe. Bes heyamekê li ser qonaxên wê û li ser divê min çî bikira ez li xwe terpilim. Heyama herî zêde tirs

da min an jî herî zêde endîşe da min heyama ewil a çêkirina testê bû. Dûre min û vê rewşê zû li hev kir. Li ser laşê xwe min tu pirsgerêk bi vê HIVê re nedît, nabînim jî. Lê belê ji hêla psîkolojîk ve helbet xwe wekî astengkirî dibînim.

Dema ez bûm HIVpozîtîv ez difikirim wê hin tişt di jiyana min de ji hêla psîkolojîkî ve ber bi xerabiyê ve biçê, lê peyre min ew çewtî ji ser xwe avêt. Mahniya hin tiştan divê HIVpozîtîvbûn nebe, divê bi daxwaza takekesî ya kesan be her tişt. Gelo hin tiştên ku bo HIVpozîtîvê li wan miqate bim nabin, na piranî nabin. Ji ber ku min ji bîr kir. Ji ber ku HIVpozîtîv ne nexweşînek e, bes di demên westandî de naçim tu deveran. Ez jî wekî her kesî dema pîrr serma digrim nexweş dikevim. Dema nexweş dikevim alkol û cixare bandorek neyinî li min jî dikin, ma ev ji bo her kesî ne wisa ye jixwe. Dema tu çûyî klûbeke şevbihurkê birayek besî te be, besî te ye. Di wan deman de ji bo sosyalbûnê zêde zorê nadim xwe.

Lê belê dixwazim vê yekê jî nîşan bidim ku ez dibêjim ez ê zordariyê civakî ên li ser HIVê demeke dirêj jî li ser xwe hîs bikim. Nemaze di têkiliyên xwe yên hestiyarî de ez ê vê zordariyê bêtir li ser xwe hîs bikim û a rast ez aneha vê zordariya psîkolojîkî li ser xwe hîs dikim.

Carinan di jiyana xwe ya taybet de tu dikî ku dest bi têkiliyeke nû bikî, lê piranî mecbûr dimîni bê despêkirinê dawî lê bîni. Ji ber ku tu HIVpozîtîv î ger her tu dermanê xwe bixwî pirsgerêkên fizîkî nabîni, lê carinan dibe ku ji hêla psîkolojiyê ve serobino bibî. Ez û hevalên nêz ên HIVpozîtîv, wekî kesên neînfekte ji hêla fîzyolojîkê ve jiyaneke saxlem dijîn. Heta ku pîrî caran ji wan saxlemtir dijîn. Ji ber ku em ji wan bêtir werzîşê dikin, bêtir li xwarina xwe miqate dibin. Ez dikarim bibêjim ku bandora vê yekê bû min dest bi werzîşê kir.

Dema hûn HIVpozîtîv bin dawî li cudaxwaziyan nayê. Bo mînak, dema min xizmeta tenduristiyê girt rastî cudaxwaziyan hatim. Ev salek e, demên min teşxîsa HIVê wergirt jî min kontrolên xwe dida domkirin. Her carê diçûm min dokorekî din didît û tev jî nas bûn. Demekê şûn de dokorekî nû hat û ji min xwest ez cardin testa *Elisayê* bidim çêkirin. Min jî bê ku li ser bifikrim min testê da çêkirin. Dûre

dema li ser fikirîm min ji xwe re go, “min çima çêkir.” Ji ber ku ev ê teşxîsa min a berê neguheranda. Peyre ji bo encamdayînê cardin gazî min kirin. Kerbên min rabû, min go “hûn çi dikin li vê derê!” ji doktor re. Doktor jî ji min re go “min ya we şaş kir bi miayeneya berî leşkeriyê.” Min jî bi dij jê re go “rewşeke min a bo leşkeriyê heye gelo? Ez zilamekî çend salî me!” Li wê derê kerbên min pir rabûn, dûre min giliya wî doktorî kir. Bi sedem ku çêkirina testê ji hêla psîkolojîkî ve cardin wê strêse bi min da jiyandin. Jixwe min ew pêvajoyê derbas kirine, wek ku cardin tê re derbas bûim.

Cardin jiyandina wê pêvajoyê psîkolojîkî canê min teng kiribû. Cardin testê dikin, cardin gazî te dikin, cardin hin kes wekî ku cara ewil be li odeya dawîya wê korîdorê dirêj ji te re rave dike. Bi ser de ji vê yekê jî pir aciz im, cara ewil ji min şeweya tîkiliya cinsî û meyla min hat pirsîn. Min ji ji doktor re diyar kir ku ev berê jî ji min hatine pirsîn. Min pirsî bê çima we vê testê bi min da kirin. Hin pirsên din jî pirsin derbarê nasnava min a zayendî û meyla min de. Min jê re eşkere kir ku ez xebatkarekî di biwara polîtîkayên sosyal de li qadê dixebitim, min daxwaz jê kir ku li ji kerema xwe dikarim li testan binêrim; doktor bi lez û bez go “temam” û dev ji testê berda.

Min ew dem fahm kir esil ew tiştê ku dikin xebatek e. Ji bo ku karibin wan pirsan ji min bikim lazim bû pêşî destûrê ji min bigrin. Bi ser de beleheq xwîn ji min standin û mecbûrî min ew pêvajoyê, ew strêse cardin ezmûn kir. Taliya talî ez ne li ser teşxîsê li ser çavdêrî û kontrolê çûbûm cem wî doktorî. Naxwazim xwehezî bikim lê belaheq xwîn ji min girtin, bi ya min di vê xalê de doktor mahremiyeta nexweşan dabîn nakin. Doktor bi doktor diguhere lê di vê xalê de gelek mîameleyên kêfî jî çêdibin. Ecêb e, dema ez li benda wê testê bûm ez dîsa ketim psîkolojiyêke wiha, min go gelo ez ne HIVpozîtîv im. Ev hêviyêke pîrr xerab bû ji bo min û ji hêla psîkolojiyê ve ez serobino kirim. Canê mirov gelek teng dikir. Li gel van nimûneyên xerab, doktorên jin ên li nexweşxaneyê Şîşî Etfalê pir li te guhdarî dikin û di biwara HIVpozîtîvê de pir zana û mirovên profesyonel in. Di vî warî de ji doktorên xwe gelek razî me. Doktorê min ê malbatê jî hay ji her tiştî heye û bi hişmendî û eleqeyêke mezin nêz dibe.

Berê bes ji bo homoseksuweliyê lazim bû ez zelal bim. Aneha di nav têkiliyekê de, yan jî bi hinar re têkilî deynim lazim e ji wan re zelal bim, yanî tê wê mahneyê ku him wekî homseksuwelek him jî wekî HIVpozîtîvek zelal bim. Helbet ji bo ku tu wekî HIVpozîtîv li hember mirovan zelal bî haydariyêke cuda û wêrekî jê re divê. Nemaze jî li hember wan kesên ku dixwazî tiştên hestiyarî di navbera we de hebin, hîn zortir e. Lewra piştî HIVpozîtîvbûnê pêvajoyê qet ne hêsan e. Bi van tiştan re pirsgerêkên min çêbûn. Her ku tu di nav xwe de rewşa xwe ya HIVpozîtîvbûnê çareser bikî jî, ne hêsan e kesê li hemberî te di vî warî de xweşbîn be. Ji ber ku tu nizanî berteka kesê li hemberî te bertekeke çawa ye, carinan dibe ku mirov rûberîbûnên ecêb bibîne.

Her çiqas tu bi awakî fizîkî û ruhî gelek nêz hîs dikî dîsa jî tu nikarî parve bikî, ji parvekirinê fikare dibî. Ji ber vê yekê jî ew nêzikatî tu carî ava nabe. Mirovê li hemberî te ji ber ku di mijarê HIVê de ne xwedî hişmendiyekê ye serê te jî di warê xwe aşkerekirinê de tim tevlihev dibe. Bi awakî fizîkî, laşî gelek jê hez dikî lê belê dizanî ku di vê mijarê de ne xwedî hişmendiyekê ye û mixabin endîşedar dibî. Pîrî caran, di hundirê xwe de ji xwe dipirsî, ez ê çawa bi wî mirovî re bijîm an jî pê re têkilî deynim. Ez dibêm wekî gelekî HIVpozîtîvan ez jî di vî mijarî de pirsgerêkan dibînim.

Ji bilî jiyana xwe ya taybet jî hewl didim xebatên haydarîkirinê bikim. Li komeleya lê dixebitim bi taybetî li ser kêmendaman û penaberan dixebitim. Di nav performansên min ên hunerî de çêlî van mijaran dikim, dixwazim haya xelkê jê bikim. Gotarên bi bandor ên li ser HIVê hene di bîra min de, dîsa projeyên ku kesên bi HIVê dijîn û şahidan bîne cem hev hene. Ez dixwazim çalakiyan li dar bixim ji bo ku kesên HIVpozîtîv û HIVnegatîvan, merivên wan, derdorên wan ên civakî bi awakî fizîkî û hestiyarî bîne cem hev.

Ji bo vê yekê jî tevî komeleyên xebatkarên HIVê û LGBTÎyan, mebesta min ew ku hawirdorekê ava bikim ku di nav hawirdorên sosyal ên takekesên HIVpozîtîv de ne bi axaftinên li ser HIVê lê belê belkî jî bi neaxaftina li ser wê sosyal bibin û bikevin nav têkiliyê. Dixwazim hawirdorekê, mekanekê ava bikim ji bo ku kesên HIVnegatîv û yên

di vî warî de haydar in ahengeke sosyal pêk bînin. Ez dixwazim bê fahmkirin ku kesên tên wê derê HIVpozîtîv bin HIVnegatîv bin zêde ne girîng e, tu tiştî diyar nakin. Dixwazim hin tişt li ser haydarbûna pozîtîvbûnê pêk bînin. Mebesta min ew e ku ev girseya haydar hin tiştên hevpar biafirînin, li hemberî fobiya HIVê bi hev re têbikoşin. Ez dixwazim mirov bizanibin, ji bo ku mirov bibe aktîvîstê HIVê ne hewce ye mirov bibe HIVpozîtîv. Dixwazim hîn xebatan bikin ji bo vê yekê. Lewra ev xalekî girîng e. Dema tu wekî takekî empatiyê li ser hema yek ji mijarekî saz bikî, dema tu karibî têkoşîneke hevpar bikî her tişt hîn hêsantir pêş ve diçe.

Dema ez werim ser xala plankirina pêşeroja xwe, helbet hin xalê bi endîşe hene. Dîsa jî rê nadim vê rewşê ku bandor li ser hestên min, li ser xeyalê min bike. Di planeke xwe ya pêşerojê de endîşeyên min li ser xwegihandina mafê tenduristiyê ne bê ka ez ê çawa çareser bikim. Mesela berî teşxîsa HIVê min li derveyî welêt jiyana xwe meşand û di vî warî de haydar nîn bûm. Berê min guh nedida karê sîgortayê. Berî vê bûyerê di gurcîkên min de kevir hebûn. Li derveyî welêt kevirên min ji min diçûn, êşên min gelek bûn. Li bajarê lê dimam nexweşxaneyek dildaran hebû xizmeta bêpere dikir. Ji ber nebûna sîgorteyê ez çûm wê derê, an na wê gelek zehmet bibûya ji bo min. Ji ber wê yekê piştî teşxîsa HIVê dema planan dikim li mijarê tenduristiyê jî difikirim. Nemaze emrê te li ser temenekê be, mecbûrî hest dikî di xala tenduristiyê de xwe bixî bin ewlehiyê. Ji ber vê yekê xebateke SSKî [Saziya Sîgorteya Sosyal] biqasî perê tu werdigrî girîng dibe. Mesela dixwazim derveyî welêt bijîm, heta ku daxwazname jî heye lê ji ber xala bidestxistina mafên tenduristiyê endîşeyên min hene. Ev ne bes di xala HIVê de heye. Endîşeya min a xala bidestxistina mafên tenduristiyê rê li ber hin biryarên min ên dinokî digre.

Bi ya min hema hema niv ji xebatkarên tenduristiyê di mijarê HIVê de xwedî zanîne ne. Qet ji bîr nakim, dermanfiroşa min a tim jê distînim, dermanên min dixist kîsa reş, her ku ev rewş xweşa min neçe jî min nedixwest tiştek bibêjim. Carekê rasterast ji min re go “gelo hûn dixwazin ez dermanên we têxim nav kîseke reş?” Min jî ji dermanfiroş re go “hûn zêde mezin nakin gelo? Ev bi tenê derman e.

Ez çima bixwazim ku hûn bixin kîsa reş?” Jiber xwe dibêje wek ku tişteki baş dike, lê belê ev jî cudaxwazî ye. Carina mirov tişteki nekin jî di eslê xwe de tiştê herî baş dikin. Ji ber ku dema li wê derê kîsekê dide min bi wê mantixê tevdigere ku ji wî kirî fediyeye civakê dinixumîne.

Serê pêşî civak, mirov bi xwe cudaxwaziyê diafirîne, dewlet û polîtikayên wê yên şaş jî astengiyên civakî diafirîne. Bi ya min di têkoşîna li hemberî vê yekê de rêxistinî gelekî girîng e. Bi ya min di vê xalê de LGBTÎ+ û Tevgera Femînîst gelek hêja ne, gelek tişt dikeve ser milê LGBTÎ+ û Tevgera Femînîstan. Lewra mirovên din, tevgerên din ên civakî pir bala xwe nadin ser mijarê HIVê. Li Tirkiyê LGBTÎ+ û rêxistinên Femînîst di xala cudaxwaziyê de bêtir çalak in û pêşengiyê dikin. Hekena wek tu xelasî nîne. Wisa xuya dike di xalê HIVê de wê cudaxwazî bidomin. Ez dixwazim vê jî diyar bikim divê Tevgera Femînîst û Tevgera LGBTÎ+ ji berî wê di nav xwe de li ser mijara HIVê bi hûrgulî bipeyvin. Li Tirkiyê hin tişt hene parastina wan hêsan e û ev tiştên hanê jî pir populer in. Ji dêvla xebatên HIVê tiştên populer dikarin derkevin pêş. Gava ku ji bo HIVê tu tişt neyê kirin, li ser gotinên bi vî rengî populer polîtîka bîafirînin mijara HIVê bi tena serê xwe dimîne û parastina wê jî dikeve xaleke zehmettir.

Di warê civakî de serê pêşî di xala îstîsmarê de, jixwe piraniyên me rastî vê yekê tên, asanî bes ji ber LGBTÎ+bûnê mirov tûşî awirên xerab dibe. Civak ji zaroktiyê ve me hîni dengnekirinê dike. Tu zarok bî tu yê deng nekî, tu jin bî tu yê deng nekî, tu HIVpozîtîv bî tu yê deng nekî. Li Tirkiyê jixwe gava ku li ser zayendiyê neyê axaftin, dixwazin li ser vîrûsa ku bi riya cinsî derbas dibe jî qet neyê axaftin. Wekî civak em hez dikin hin tişt fedî bimîne. Em bi mantixa tiştê hebe ku em weşêrin tevdigerin û ez gelek aciz im ji vê rewşê. Em di çerxeke wiha de ne, mixabin ez bi tenê serê xwe bikim hawar ji zêde jî tişt naguhere.

Nameyên Jinan

Ji Yên Komeleyê re dibêjim Agirê Şevê, Di Wê Tarîtiyê de Bûn Ronahî Em Derxistin

Dema em çûn Daîreya Nîkahê, di tehlîlên me de derketibû HIVpozîtîvbûna min. Doktor diyar kirin ku xwîna çûyî xwîneke pûç e, dê cardin xwîne ji min bigrin; û xwestin ku heftakê şûnde dîsa biçim wê derê. Piştî heftakê dema çûm diyar kirin ku hîna derneketiye, ne hewceye ez biçim wê derê, telefona xwe bidim wan, ew ê li min bigerin. Tam mehek derbas bû, ew mehek wekî hezar sal dirêj bû ji min re. Di serê min de gelek pirs hebûn, min dîgo “ji ber çi dernayê ev tehlîlên xwîne.” Rojek geriyan, ez çûm. Ez gazî odeya miduriyetê kirim, li wir gotin HIVpozîtîvbûna min. Dinya bi ser min de hat xwarê. Hê jî nizamî çawa ji wê derê derketim, çawa hatim malê. Tiştê di bîra min de ye, girîna min bû, bi ware war. Ew şev xew neket çavê min, heya sibehê li ser dema mirina xwe fikirîm. Sibehê zû çûm Nexweşxaneyê Perwerde û Lêkolînê ya Hasekî. Doktor cardin ji min xwestin test bidim kirin. Wê gava diçûm xwîndayîne min hîs kir ku derbên dilê min bilind bûye. Dema nexweşxaneyê dibînim doktor an jî hemşîreyan dibînim bêhna min diçike, tansiyona min bilind dibe, min dikir wekî ku bimrim. Dûre hîn bûm, ji ber trawmayên qewimî, pantîk atak bi min re çêbûbû. Bi bîra min dikeve bi roja min nedikarî henase vedim.

Li acîla [yekîneya lezgîn] nexweşxaneyê min kir sibeh, rontgenên pişikî min jî girtin, tu tişt derneket. Her carê ku tê bîra min HIVpozîtîvbûna min di rûyê min de gotin, nikarim baweriya van bûyerên serhatî bikim. Min dîgo “çima ez.” Hevalên min giş, derdorên min giş pê hesiyabûn ku tiştek di min de heye. Lê belê min nedikarî ji kesî re tiştek bibêjim. Pêşî ji hevalên xwe dûr ketim. Min mala xwe bar kir, telefona xwe guhert. Heçko dibû derbasbûyîn bo jiyaneke nû, revêk bo bajarekî din; lê belê min çî kir jî, rastiya serhatiya min neguherî. Encama tehlîlên min wek xwe bû, tedawiye dermanxwarinê dest pê kir.

Di vê navberê de hay ji *Komeleya Pozitif Yaşamê* bûm. Her roj diçûm wê derê, axaftina bi kesên wê derê re dilê min rihet dikir. Bêsekn min pirsan dikir: gelo ez ê çend sal bijîm, ê herî zêde emir kiriye kî ye, herî zêde çend sal emir kirine. Bê zar û zivêr bersivên min dan. Hewl dan min aramtir bikin. Ez cardin yek bi yek spasiya wan dikim. Ez ji yên komeleyê re dibêjim agirê şevê, di wê tarîtiyê de bûn ronahî em derxistin. Tedawiya min a dermanê bi êrênî bersiv da, di wê navberê de, daketim negatîvê. Lê belê di jiyana me de rastiyeke neguherbar hebû; êdî ji doktoran, ji nexweşxaneyan, ji hemşîreyan ditirsîyam. Hê jî dema dibînim tansiyona min bilind dibe, derbên dilê min diguherin, ez fahm nakim bê çî bi min dibe. Çawa karê min û doktora diqede, dertêm baxçeya nexweşxaneyê tu tiştên ne xweş namîne. Di pêş de gelo ew ê vê trawmaya min baş bibe, nizanîm. Bi vê salê re ketim sala xwe ya şeşan, gelo bêyî ku ji kesekî re bibêjim ev sir ew ê heya mirinê bi min re be, nizanîm.

Kurê Min Bi Hevala Xwe Re Zewicî. Gelekî Bextewar În. Înşelax Di Nêz De Dibim Dapîr

Merhaba. Kurê min di sala 2014an de kurte kurt dikuxikî û gelekî westiyayî, di rewşeke bêhal de bû. Dema em diçûn cem doktoran antibiyotîk didanê. Digotin “divê zarokê we bêhna xwe bide, serma girtiye.” Ji dêvla ku zarokê min bi dermanxwarinê baş bibe, her roj diçû xerabtir dibû, nikaribû ji cihê xwe rabe. Di wê rewşê de em çûn acîlê. Bi teşxîsa zatoreyê, bi ambûlansê em şandin Nexweşxaneyê Nexweşînên Singê. Li wê der bi teşxîsa zatoreyê, em dan razan. Di wê

kêliya tedawiyê de em neqlî odeyek yekkesî kirin û helwestên wan guherî bû. Heta ku karkerê paqijiyê ji me re digo “hûn jî maske li xwe bikin.” Min digo qey bo hijyenê ev ewqas fitozî dikin. Dema em ji nexweşxaneyê derketin gotin “ji nişka ve em dikarin li we bigerin.” Min go “ji ber çi? Tedawî neqediya gelo?” Gotin “Na. Tedawiya we qediya lê em li benda encamên labaratorê ne. Diyar bibin em ê li we bigerin.” Min di dilê xwe de go ger tiştê girîng bûya nedihîştin em biçin, min guh nedayê. Em ji nexweşxaneyê derketin.

Di nav heftakî de telefon kirin cardin gazî me kirin nexweşxaneyê. Wextê em çûn, doktorê înfeksiyonê em birin odeya xwe. Bi xemgînî û wek ku li ber min bikeve diyar kir ez HIV im. Me pirsî bê dermanê wê heye an na. Go “belê heye, lê ev derman encax heşt salan emrê we dirêjtir dike.” Wekî dayikek bihîstina wan peyvnan, wekî rabûna qiyametê ye. Ez mehf bûm; lê belê min di ku ez mecbûr im li ser piya bim ku moralê bidim kurê xwe. Doktor gelekî xwînsar bû. Dema dît ku em perîşan in go “kesên di qezaya trafikê de dimrin bifikrin. Ê we heşt salê we heye li pêşiya we.” Divêt demildest em ji wê derê derkevin, dilê min xwîn digiriya. Nexweşxaneya ku em lê tedawî bibûna rê me dan. Min kêliyên herî xerab ên jiyana xwe ezmûn dikir. Min û kurê min bê ku peyvê bikin çûn nexweşxaneya ku wan em beralî kirin.

